



Ez bihitim...

Dema em ji gundê xwe derketin, ez ne biçûk bûm û ne jî mezin. Ez di temenkî wisa de bûm ku ez bibim sedsalî jî, ez ê bîranînên wê demê jî bîr nekim. Gundê me gundekî xwerû êzîdî bû, tenê xwendegeha destpêkê (seretayî) lê hebû... *Asya Xorzan / RÛPEL - 5*



Heştê Êvarê

Şekir qîza apê bavê min e, çima navê wê danîne Şekir ez jî nizamim. Şekir jineke jêhatî ye lê derheqê mafên jinan de haya wê jî tiştêkî tune ye. Ev demeke dirêj e ez jê re behsa ser-pêhatiyên jinan dikim. Dawiyê min jê re behsa 8'ê Adarê kir... *Kawê Redkan / RÛPEL - 10*



Li ser romana Pêşmerge

Rehîmê Qazî di romana xwe de tenê behsa şerekî nake, behsa îqtîdarê, kevneşopiyên û feodalîteyê dike. Behsa jina tune dike, di ci-vaka heyî de rola jinê diyar dike, mêrê xurtir dike, jinê zeiftir dike. Jina heyî jî bo mêr, ji bo namusa mêr heye... *Sallha Ayata / RÛPEL - 8*

Rojnameya Heftane

www.xwebun.org

xwebûn

2-8 Adar 2020

Hejmar: 11

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

Gel xwest parêzer biçin Îmraliyê

Li girava Îmraliyê piştî ku şewat derket, rêxistinên kurdan û parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan têkildarî mijarê daxuyanî dan û xwestin ku demildest parêzer biçin giravê û bi Ocalan re hevdiştinê pêk bînin. Hat gotin ku şewat ne tesaduf e û wekî listikên dewleta tirk hat binavkirin. Di serî de li Kurdistanê, li gelek deverên cihanê gel daketin kolanan û çalakiyên girseyî lidarxistin... *RÛPEL - 7*

Vîrûs hat ber derî

Vîrûsa koronayê çend roj berî niha li Îranê jî hat ditin û ji ber nexweşiyê heta niha li Îranê bi dehan kesan jiyana xwe ji dest daye. Her wiha li başûrê Kurdistanê jî ev vîrûs hatiye tespîtkirin. Her roj bi hezaran kes ji Îranê derbasî Wan, Agirî û Colemêrgê dibin. Divê demildest çûnehatin bihata qontrolkirin, gel bihata hişyarkirin û tedbîr bihata girtin lê mixabîn ev yek bi derengî ket... *Dr. Erdal Sipan / R.3*

Kurdî fêrî biyaniyan dike

Kesên ku bi rêya medyaya civakî zimanê kurdî ferî neteweyên din jî dikin hene. Yek ji van kesan jî Gulê ya ji Toristana Mêrdînê ye. Gulê, bi navê Kurdish (Kurmanji) Lessons, li ser hesabê medyaya civakî; twitter, instagram, facebook, youtube û discordê zimanê kurdî fêrî kesên biyaniyan ku dixwazin hînî kurdî bibin, dike. Têkildarî xebatên xwe Gulê, ji rojnameyê re axivî... *RÛPEL - 3*

Dengbêjî ruhê jinan e

Dengbêjî ruh, bîr û ramana jinê ye ku bi rêya çemek gur û geş ê jî çandê diherike, dibe hizir û ferasetek ku civak pê teşe digire. Dengbêjî bûye kaniyek herikbar a çanda kurd û di her serdemekê de bi awayekî dengê civaka kurd a bi êş, keder, koçberî, şer, serhildan û hwd. gi-handiye û heya roja îro parastiye...

Zehra Mohammedzadeh / RÛPEL - 2



Di oxira jiyane de 8'ê Adarê... *R.2*

Di Avestayê de jin... *Aysel Tabak / R.12*

Enqere di siyaseta şaş de israr dike

Dewleta tirk salên dawî di siyaseta xwe ya derve de li şûna lihevhatinê esas bigire di siyaseta pevçûn û kaosê de israr kir. Hem li hindir hem jî li derve xitimiyê û nikare siyaseta bike. Ji bo li Idlibê hebûna xwe biparêze sewkiyatên leşkerî dikin. Gelek sewkiyatên wan jî hêla balafirên Rûsya ve hatin bombebarankirin û di encama van

bombebaranan de gelek leşkerên tirk jî hatin kuştin. Rêveberiya Erdogan ji bo bikaribe xwe ji vê rewşa kambax derbixe li Ewropayê di nav hewildanên dîplomatîk de ye. Hemû kesên rewşa herêmê jî nêz ve dişopînin dizanin ku dewletên Ewropa û NATO'yê li ser herêma Idlibê Rûsyayê nadin hemberî xwe... *Felenez Ulug / RÛPEL - 7*

Li Idlibê 33 leşker hatin kuştin Xwe avêtin bextê NATO'yê

Rayedarên dewleta tirk ragihandin ku li Idlibê di encama êrîşa hewayî de 33 leşkerên tirk hatine kuştin. Têkildarî mijarê li Enqereyê civîn hatin lidarxistin û her wiha bang li NATO'yê kirin ku mûdaxeyî şerê li Idlibê bikin... *RÛPEL - 7*

Herî zêde dayikan ziman parastiye

Berdevka Komîteya Perwerdeyê ya Kantona Qamişloyê Menan Mihemed Emîn û Endamê Komîteya Perwerdeyê ya Kantona Qamişloyê Goran Şakir bersiv dan pirsên me. Wan diyar kir ku herî zêde dayikan ziman parastiye... *Hevpeyvîna Ersîn Çaksû / R.4*



Di demeke dîrokî de kongreya HDP'ê

Di nav geşedanên dîrokî yên li Rojhilata Navîn de, li gel gelek êrîş û zextan, hem pêkanîna kongreyê, hem jî naverok û atmosfera wê, careke din pozîsyon û aktor-bûna HDP'ê muhkem kir. Di vê qonaxa nû de, HDP'ê zimanekî nû, stratejiyê nû û polîtîkayê nû da ber xwe. Ji meseleya kurd bigire heta kêşeyên Tirkiyeyê, ji siyaseta şer bigire heta avakirina aştiyê li ber HDP'ê ne... *RÛPEL - 6*



Oxir be Seîd Yûsif

Hunermend Seîd Yûsif ku hemû jiyana xwe di xizmeta muzîka kurdî de derbas kir li Stenbolê çû ber dilovaniya xwedê. Cenazeyê Yûsif ber bi Qamişloyê ku di strana xwe de digot 'Qamişloya Bajare Evinê' hat oxirkirin... *RÛPEL - 11*

Rawestgeha stasyona şiyariyê

Mizgîn Ronak

Bila baran bibare. Zivistan hukmê xwe saz bike berf û çêsa bireqisîn li ser serê me. Em kurd bin, bimirin. Li Serêkaniyê, li binê kaniyê, li ser darên zeytûnan bimirin. Kurdnol! Mîrin çî xweş e. Bila baran satila xwe ji ava emrê me tije bike, berf bi canê me ji xwe re aşûtan çêbike, çîjkên reş ên vê zivistana reş, bi porê me ji xwe re hêlman çêkin û em bimirin, hêdi hêdi, lez bi lez. Li ber derî, li jêr xetê, li paytext û piştê. Kurdiya mirindar çî xweş e! Bila berf bibare, asîman kûrahiya xwe bi nasnameyên şehîdan dagire, destên qedere dîsa çarenûsek bextewar binûsin bo kurdiyê. Bila kurdiya dîn bibe li ser sifreya guran, bibe mayînek... Her tişt teqîn e êdi.

Serhildêriya bi hezaran salan çî domdirêj e! Kuştîyên serhildêr çîqas zehf û çîqas bi kêf in! Li jêr xetê, li jor xetê, berî Qesra Şîrîn, piştî Keyakisar li gel Bedirxan, Besê û Zarîfeyan. Bi Zîlan û Arînan. Mîrin gelek li te hatiye ey kurdiya wekî baskê şikêstî tenemayî.

Em çarenûsê li ser kazîzên zeminên zer binivîsîn û bi avê re berdin. Bila av wê bibe, gamasî wê bixwin. Em ê bi bêçarenûsiyê ji xwe re keştiyek çêkin. Na, ya Nûh nîn e. Na Titanik jî nîn e. Keştiyek ku rêwiyan wê tev bi azadiyê dînin bûne û bi dînbûnê jî bûne aqilmend. Keştiyek ku her kesê lê kaptan e.

Geogres Perekê ku Nazîzmê wî ji zaroktiyê ve bê dê û bav hiştîye dibêje: “Xemsari ziman betal dike, îşaretan bêwate dihêle.” (Uyuyan adam, Metis) Ziman li ku betal dibe, bernavên (kodên) wî yên ku di hişê me de hatine kolandin behsa çî dikin? Mesela ku em dibêjin “kurd” çî tê bîra me, çend rêzeparagraf didin dû hev? Dema ku “dinya” tê gotin “mala me” tê bîra me yan mala xelkê ya ji bo me dojeh, koçberî û xerîbî ye? Kê akorda vî mejiyê nivîrtari û nivronî wiha saz kiriye? Feodal, koledar û mijokdarên ku di dil û hinavên hebûna me de bi rûpoşên “şoreşger, muxalif û welatperwer” direqisîn; me ber bi ku ve dibîn?

Bisekine, ey çerxa ku di bin her navî de di zivire û me ber bi dubareya dubareyan ve diravîne! Em gihîştin stasyona şiyariyê, rê qediya, rêwî êdi nameşe bi korkanî.

Ku xemsari betalkirina ziman be çend cureyên wê hene? Zimanê ku timî wek xence-reke zengarî eynî tiştî dibêje ji ne cureyek xemsariyê ye? Xwe bêqûsûr û baştirîn, tim û tim baştirîn ditin ji ne tewreyek ‘xemsariyê’ ye ku zimanê li devê me dike koremarek û pê jehriyê dibarîne. Ma gelo hevokên “kurd çar parçe ne, kurd nabin yek, kurd sed parçe ne... Kongreya neteweyî pêwîst e.” û hwd. hwd. êdi ziman, dil û guhên we ji bi jehra dubareyê naêşîne? Heyra rast e; kongreya neteweyî lazîm e, xwedî wate û girîngiyek dîrokî ye! Lê dê heta kengê ev hevok bînin dubarekirin? Ma dubarekirina gotina “dubarekirin” a di vê nivîsê de ji ne encama jehra wî koremarî ye li dev û hişê me daye? Tam li vir nalenala Nûrî Dêrsimî tê guhên min: “Destên xwe bide ser vê birînê/nikarim bigirim pêşiya vê lehiya xwinê...” Ev jehrî, ev lehiya xwinê dê me bife-tisîne ey Kurdistan! Êdi hewceyî mijokdar, kolonyalist, kedxwar û dagirkeran nake! Kurmên darê wisa mezin bûne ku hût ji li ber wan ne hût in. Lê em gihîştin rawestgeh-stasyona (çîma bê ‘stasyon’ ji min re kêmwate tê) şiyariyê. Xweliya xwe birîjine welato bi ser serê her tiştî de. Li defa hewarê bixê bi lédana dilê me yê hezarsale. Şiyarî şoreş e, şoreş şiyarî ye. Çav li serê me bûne tas lê ne ji şaşwazi û tirsê, ji şiyariyê! Palet û postalên kolonyalistan (çîma îro bi taybetî ‘kolonyalist’ ne mijokdar, mêtînger û gelek reşnavên din?) hukmên xwe yên li ser giyana te û giyana me, bedena te û bedena me wenda kirine. Êdi xew li me heram e êdi xeflet û sergêjî nîn e. Ji şiyariya me û te re merheba ey stasyona şiyariya diwartirîn, li kaviên “vê dinyalikê!”

Di oxira jiyane de 8'ê Adarê

Jinên kurd û cihanê dê îsal jî li dijî hemû astengî û qedexeya di 8'ê Adarê Roja Jinên Cihanê de bi daxwaz û hevîyên xwe dakevin qadan

Navende Nûçeyan

Di dîrokê de gelek jin hene ku li hemberî neheqî, zordarî, kolefî, bêmafîyê serî rakirine û têkoşînek bêhempa dane meşandin. Lê belê ji ber dîrok ji aliyê desthilatdaran ve hatiye nivîsîn, têkoşîna gelek jinan a dîrokî nehatiye vegotin û nivîsîn. Yan jî dema hatiye gotin jî rastiya dîroka jinan hatiye berovajîkirin û wiha hatiye gotin. Berovajîkirina dîroka jinan a ji aliyê mîrên serdest ve, hatiye xwestin jin her tim kole bimînin û rastiya xwe nizanibin. Çîmkî mîrê serdest dizane ger jin hişyar û zana be dê civak ji pê re hişyar bibe û bibe xwedî zanîn û

dawî li desthilatdariya wî bê. Ji bo ev tişt pêk neyê her tim li ser jinan zext li civakê kiriye. Lê hemberî zextan jî her tim berxwedan û serhildana jinan pêk hatiye.

Dîroka 8'ê Adarê

Yek ji van serhildanên bi nav û deng, serhildana jinên kedkar a di 8'ê Adarê de ye. Di 8'ê Adara 1857'an de li bajarê New York Amerîkayê 40 hezar karker ji bo heqdestê xwe bistînin di fabrîqeya tekstîlê de dest bi greva giştî kir. Karkeran li ber deriyê fabrîqayê barîkat danîn, li ser vê yekê polîsan êrişî karkeran kir û derî li ser jinên karker ên di fabrîqeyê de bûn girtin. Di encama vê yekê de di fabrîqeyê de şewat derket û 129 jin bi şewatê jiyana xwe ji dest dan. Vê bûyerê li cihanê deng veda. Femînîsta alman Clara Zetkîn di Enternasyola 2'yemîn a sala 1910'an de pêşniyar kir ku 8'ê Adarê bibe Roja Jinên Kedkar ên Cihanê û ev pêşniyar bi

dengdayîneke mezin hat qebûl kirin. Piştî vê biryarê 8'ê Adarê li hemû cihanê bi çalakiyên cur bi cur ji aliyê jinan ve tê pîroz kirin. Ev roj ji bo jinan bûye roja têkoşîna li hemberî bêmafîyê û serkeftina jinan.

Mîrov dema tenê li vê bûyerê jî binêre dibîne ku jin ji bo bîdestxistina mafên xwe yên ku hatine desteser kirin, berdêlên pir mezin dane û di oxira vê de jiyana xwe ji feda kirine.

Jinên cihanê li ser piyan e

Jinên cihanê ji bo bîranîna jinên serhildêr, bîdestxistin û parastina mafên xwe yên ku di oxira wê de berdêlên giranbuha hatine dayîn, di her 8'ê Adarê de dadîkevin qadan û li her derê dengê xwe bilind dikin.

Wekî her derê cihanê, jinên çar parçeyên Kurdistan, Tirkîye û Rojhilata Navîn (ku bi salan e di nav şer de vê rojê pêşwazî dikin) jî 8'ê Adarê bi çêşke mezin pîroz dikin û dengê xwe digihînin cihanê.

Bi taybetî jinên li bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê ev çend sal in di bin zextên desthilatdariyê de hewl didin roja xwe pîroz bikin. Nexasim jinên kurd ên Bakur tevî hemû zext, astengî û qedexeyan berxwedana ku di nav salekê de dane meşandin bi pêşengiya Tevgera Jinên Azad di 8'ê Adarê de derdixin asteke jor.

Jinên kurd ku her sal bi dirûşmên cur bi cur çalakiyan li dar dixin, par bi dirûşma 'Jin ji bo azadiyê li ber xwe didin, jin di grevê de ne' li qadan bûn û bûbûn dengê hemû jinan. Piştî berxwedana salekê dê jinên li Bakur bi dirûşma 'Em jin di azadiyê de bi îsrar in, di têkoşîna de bi biryar in' li her derê çalakiyên xwe pêk bînin.

Heta niha hemû amadekariyên ku ji bo 8'ê Adarê Roja Jinên Cihanê hatine kirin, temam bûne û ji bo tevlebûna jinan bang hatin kirin.

Bernameya hevpar a çalakiyan



Li aliyê din Tevgera Jinên Azad (TJA) û Meclisa Jinan a Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ji bo çalakiyên 8'ê Adarê bernameyeke hevpar amade kir. Li gorî bernameyê dê bakurê Kurdistanê bajar bi bajar bi dirûşma 'Em di azadiyê de bi îsrar, di têkoşîna de bi biryar in' çalakiyên cur bi cur bînin lidarxistin. Li gorî bernameya hevpar dê li bajarên Amed, Dêrsim, Mêrdîn, Sêrt, Riha, Meletî, Semsûr, Dîlok, Êlih, Colemêrg, Mûş, Wan, Îdir, Agirî, Bedlîs, Qers, Mîrsîn û Edeneyê qumefîl û belavok bînin belavkirin, şahî bînin lidarxistin, panel û gotûbêj bînin organîzekirin û herî dawî jî mîftîg bînin lidarxistin.

Her wiha starta çalakiyên 8'ê Adarê li ser Pira Dînar a Dêrsimê hat dayîn ku xwendekara Zanîngeha Mûnzûrê Gulistan Dokû lê wenda bû û zêdetirîn du meh in agahî jê nayê wergirtin. Bang li hemû jinan hat kirin ku li dijî zext û zordariyê bi hev re têbikoşin.



Dengbêjî ruh, bîr û ramana jinê ye ku bi rêya çemek gur û geşê ji çandê diherike, dibe hizir û ferasetek ku civak pê teşe digire. Dengbêjî bûye kaniyek herikbar a çanda kurd û di her serdemekê de bi awayekî dengê civaka kurd a bi êş, keder, koçberî, şer, serhildan û hwd. gihandîye û heya roja îro parastîye. Nexasim ev yek bi rêya hest û ramana jinê, baldariya wê ya di mijara bûyerên rojane yên di nav civaka kurd de diqewimîn hîn rengê cuda girtiye.

Ger civaka kurd heya îro karîbûye xwe ji hêla çand, huner û wêjevê ve biparêze, ev yek heya astekê bi saya hunera dengbêjiyê pêk hatiye. Bi taybetî jî dema em civaka kurd a ku her tim û di her pêvajoyekê de rastî qirîkirinê dihat binêrîn; nexasim jî di pêvajoyên ku zimanê nivîskî yê kurdî ev çend pêş neketîbû, em ê rola dengbêjiyê ya di zindihîştin û parastina ziman de jî hîn baştir bibînin.

Ji bo wê jî girîng e mirov balê bikişîne ser rola jinê û serîrakerîna wê ya li dijî qirîkirina fizîkî ku bi dengê xwe yê zelal ji bûye bend li ber êrişên qirîkirina çandî.

Bêguman bi pêşketina pergala mîrsalar û feodal de, bi taybetî jî bi ol û qanûnên pergala patriarkî ku li ser jinê hatiye ferz kirin, jin gelek caran rastî zext û astengiyên hatiye û xwestine pêşi li deng, reng



Zehra Mohammedzadeh

û awaza wê bigirin. Ji ber ku pergala serdest pir baş dizane, her gotin, qêrîn û nalîneke jinan bi hezaran serpêhatiyên civak û jinan radigihîne. Û ev deng van peyamen ku bi dengbêjiyê jî dîrokekê ber bi dîrokekê din ve diherikîne, radigihîne û dibe bîreke zindî ji bo gelê kurd. Her lorandî û gazinên wan şîbakeyê nû ye ku ber bi rastiya civaka kurd ve vediibe.

Li rojhilatê Kurdistanê çanda dengbêjiyê xwedî girîngiyekê mezin e. Bi taybetî heya roja îro jî li herêmên Makû, Xoy û Ûrmiyê çanda dewlemend a dengbêjiyê karîbûye xwe biparêze. Lê mirov nikare ji bo dengbêjiya jinê vê yekê bibêje; ji ber astengî û politîkayên dewletê dengê herikbar ê jinê asteng kiriye û rê li tunebûna çanda dengbêjiya jinê hatiye vekirin. Gotina kilamên ku qala koçberiyên bi êş, evîn, çîrokên jinê, serhildanên kurdan kirine, bi demê re ji bo jinan wek germ hatiye ditin. Ev yek jî bi kodên civakî ku bi ol, kevneşopî û paşverûtiyan li ser jinê dihat ferz kirin, dihat

kirin. Nexasim piştî şoreşa îslamî ya Îranê deng û awaza jinê tê qedexekirin û ji ber bandora olê dengê jinê guneh tê ditin. Di civat, dawet û şînan de gelek caran jinan stran digotin, lê li derve, cihên komî ev yek zêde nepêkan bû. Elbet ev yek jî bi demê re jî holê radibe. Jixwe heya salên 1960-69'an (her çend dengbêjî li Rojhilata pir li pêş bû jî), jinên dengbêjê zêde dervediketin pêş. Ji bo cara yekê li radyoya Ûrmiyê ya beşa kurdî (ku niv saet, saetekê weşan dikir), di sala 1917'an de wê Îran Xanimê stran bigota.

Îran Mucerd (navê wê yê hunerî Îran Xanim e), yekemîn dengbêja jin bû ku li rojhilatê Kurdistanê, bi daxwaza hunermend Hemîd Yûsifî, Mistefa Elîzade, Îbrahîm Nurozî bi zaravayê kurmançî wê di sala 1971'î de, bi awayek fermî di radyoya Ûrmiyeyê de dest bi dengbêjiyê bikira. Ew di navbera salên 1950-1951'î de, li rojhilatê Kurdistanê, gundê Înkêsû ya herêma Bîradostê tê dinyayê. Ji 1971'î heya 1979'an, Îran Xanim ji

bo tomarkirina stranê her du mehan carekê wê biçê radyoyê.

Ew stranên herêmên bakurê Kurdistanê, bi taybetî jî yên herêma Serhedê dixwîne: Bi dengê wê yê zelal wê stranên “Bajo Emrê Min”, “Delal Ez Bi Heyran”, “Dilê Min Loy Loy”, “Lê Lê Yeman” û “Şerê Cezû û Salîhbeg” li asoyên welat olan bidana. Her çend tê gotin gelek stranên wê bixwe jî hebûne, lê ji ber ku nehatine tomarkirin, heya roja me ya îro nehatine. Mixabîn gelek jinên dengbêj ku stranên wan nehatine tomarkirin, her wekî navê wan, kilam û dengê wan jî wenda bûye.

Di salên dawî de li bajarên Rojhilat xebatên çandî yên ji bo zindîkirina çanda dengbêjiyê hatibin meşandin jî têr nakin. Nemaze piştî 2003'yan, li Ûrmiyeyê şevbêrkên tenê lidarxistin û hunermendên li bajarên cuda dicivin, hunera xwe pêşkêş dikin. Lê sed mixabîn politîkayên dewletê rê nadin ku jin ji beşdarî wan şevbêrkên bibin û hunera xwe pêşkêş bikin.

Dengbêjî ruh û bîra jinan e

Kurdî fêrî biyaniyan dike

Gulsuma Demîr, bi navê Kurdish (Kurmanji) Lessons, li ser hesabê medyaya civakî; twitter, înstagram, facebook, youtube û discordê zimanê kurdî fêrî kesên biyanî ku dixwazin hîni kurdî bibin, dike

Qedrî Esen

Ji bilî başûr û rojavayê Kurdistanê, li parçeyên din ên Kurdistanê bi zimanê kurdî perwerde nayê dayîn. Ji ber vê sedemê piraniya kurdan, bi derfetên xwe hîni nivîsandina bi zimanê xwe bûne. Bi vî awayî jî bi salan bi rêya qursan fêr bûne. Lê di salên dawîn de kurd êdî jî internetê jî sîd werdigirin. Bi rêya medyaya civakî polên dijital ava dikin û fêrî zimanê xwe dibin.

Kesên ku bi rêya medyaya civakî zimanê kurdî fêrî neteweyên din jî dikin hene. Yek ji van kesan jî Gulê ya ji Toristana Mêrdînê ye. Navê fermî yê Gulê Gulsuma Demîr e. Gulê, li Zanîngeha Stembolê beşa zimannasiyê xelas kiriye. Niha li Russian State University for Humanitiesê li ser zimanê rusî dixebite. Di heman demê de jî bi projeyê zimanê suryanî ya Mîdyadê re eleqedar e.

Gulê, bi navê Kurdish (Kurmanji) Lessons, li ser hesabê medyaya civakî; twitter, înstagram, facebook, youtube û discordê zimanê kurdî fêrî kesên biyanî ku dixwazin hîni kurdî bibin, dike. Ji bilî van hesabên medyaya civakî



bi navê “kurdishlessons.com” malpereke wê jî heye. Ji ber ku kesên Gulê deng li wan dike biyanî ne, zimanê kurdî û îngilîzî bi kar tîne.

Detpêkirina dersan

Têkildarî van xebatên xwe Gulê, ji rojnameyê re axivî û qala xebatên xwe kir. Gulê, diyar kir ku di havîna sala 2017’an de fikra hînkirina kurdî bi îngilîzî pê re çêbûye û wiha got: “Wê çaxê zanîngeh li ber xelasbûnê bû, min Enstîtuya Stembolê asta mamostiyê jî xelas kiribû û min dixwest îngilîziya xwe pêş ve bibim. Lê min dixwest ê ku di mijara îngilîzî de alîkariya min bike, bixwaze hîni kurdî bibe. Piştî min li ser înstagramê hesabek vekir û hêdî

hêdî dest bi parvekirinê kurdî û îngilîzî kirin. Paşê min li ser facebookê kesek dît ku dixwest kurdî hîni bibe, ew jî zimannas derket. Bi xêra vî hevalî hatim Moskowê û dest bi dersdayîna kurdî kir. Xwendekarên min profesor,

doçent û xwendekarên beşa zimannên semîtîk bûn. Di destpêkê de zehmet bû jî ber ku ders bi zimanê îngilîzî bû û hem xwendekar hemû zimannas bûn, carnan pirsên wisa ji min dikirin ku ez ecêbmayî dimam.”

Xwestina dagirtina valahiyê

Gulê, destnîşan kir ku ji bo şopînerên xwe PDF notên kurdî – îngilîzî amade dike û li ser youtubeyê jî herî kême mehê du-sê video parve dike û wiha axivî: “Video li ser zimanê kurmançî bi îngilîzî ne. Wekî din hesabê discordê jî, li wir nêzî 150 kes hene. Min jî bo kesên ku dixwazin bi kurdî bixebitin û bikaribin bi kurdan re bi axivîn ev hesab vekir.”

Der barê sedema destpêkirina van dersan jî Gulê ev tişt got: “Kesên bi tirkî dizanin, li Bakûr û Tirkîyeyê, dikarin xwe hîni kurdî bikin, materyal hene, pirtûk hene, videoyên li ser youtubeyê kême jî bin hene. Lê ji bo biyaniyan tu tişt tune ye. Yanî heke biyaniyek bixwaze xwe hîni kurdî bike, ji bilî hîni materyalên jî bo mijarê tu tişt tune ye. Min dixwest vê valahiyê dagirîm û ji bo biyaniyan cihek hebe ku bikaribin pirsên xwe bipirsin, hin tiştên nû hîni bibin. Piştî amadekirina dersên youtubeyê, gelek peya-

mên xweş hatin. Dema mirov dibîne ku kesek peyveke kurdî hîni dibe, tenê hînkirina peyveke nû dibe motîveyek bo dersên nû.”

Rojava eleqeyê zêde kiriye

Gulê, têkildarî eleqeya ji bo dersên xwe jî axivî û wiha pêde çû: “Eleqeya dersan piştî vekirin û geşbûna hesabê twitterê pir zêde bû. Ya rastî bûyerên dawî yê li Rojava jî ev eleqe bi xwe re anî. Gelek rojnameger, akademîsyenên ku dixwazin li ser kurdan û kurdî bixebitin ji bo hînbûna zimanê kurdî ji min re peyaman dişînin. Ji bilî van ez dikarin bêjim di hefteyekê de du-sê caran ji welatên cuda cuda ji bo dersên kurdî peyam tîne. Ji Misîrê bigire heta Portekîzê, ji Belarûsyayê bigire heta Avusturyayê. Ez ji gelek kesan re materyalên hînbûna kurdî jî dişînim, min jî nêzî 400 kesan re pirtûk şandine.”

Keyala vegera Kurdistanê

Gulê, anî ziman ku di pêşerojê de dixwaze vegere bakurê Kurdistanê û li wir enstîtuyê zimanê kurdî veke û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Li vir ji bo biyaniyan workshopên li ser zimanê kurdî çêbikim, paşê zarokan hîni xwendin û nivîsandina kurdî bikim. Ev jî xeyalên min in.”



Ji ber xemsariya dewletê mirin

Piştî erdheja ku di meha çileyê de li bajarê Xarpêtê yê bakurê Kurdistanê pêk hat, 23’ê sibatê li bajarê Xoyê rojhilatê Kurdistanê jî bi pileya 5,7’an erhejek çebû. Li bejahiya bajêr erdhej bû sedema xesareke mezin û gelek avahî hilweşayan.

Erdhejê bandoreke zêde li herêma Serhedê ya bakurê Kurdistanê jî kir. Li gundên navçeya Elbakê ya Wanê jî ber erdhejê gelek avahî hilweşayan. Li gorî daneyên fermî yê dewletê, li gundên Elbis, Qirapî, Elezî, Kaşkor ên navçeyê bi giştî 250 mal û 300 axur hilweşayan û li 700 avahiyan xesar çebû.

Desthilat, mîna aşûta beriya çend hefteyan ku li navçeya Miksê pêk hat, Elbakê jî xemsar tevgeriya. Alîkariya pêwîst ji bo mexdûrên erdhejê nekirin. Ji ber vê yekê hem mirovan û hem jî sewalan xesareke mezin ji erdhejê dît. Ji ber vê xemsariya dewletê li navçeyê 10 kesan jiyan xwe ji dest da. Li gel mirovan, bi sedan sewal jî di bin kavilan de man û mirin. Ji ber ku alîkariyê baş ji mexdûran re nehat şandin, şeva destpêkê di bin naylon û brandayan de man.

Li aliyê din alîkariya ku ji aliyê şaredariyên HDP’ê ve ji bo mexdûrên erdhejê hatibû berhev kirin jî mîna erdheja Xarpêtê hat astengkirin. Destûr nehat dayîn ku qamyonên alîkariyê xwe bigihînin gundan û pêwîstiya li mexdûran belav bikin.

Ji bilî astengkirina alîkariya şaredariyên HDP’ê, heyeta ku ji parlamenterên HDP’ê û hevserokên giştî yê KCD, HDK û BDP’ê pêk dihat jî hat astengkirin. Polîsan, pêşî li heyetê girt û nehişt ku biçin herêma erdhejê. WAN



KURDISH
| KURMANCÎ |
LESSONS

Talde

Dr. Erdal Sîpan



Di dawîya sala 2019’an de li bajarê Wuhanê Çînê bi gelek nexweşan re zatûre hate dît. Di encama lêkolînan de hate zanîn ku vîrûsa koronayê bûye sedema vê nexweşiyê. Rêxistina Tendurîstiyê ya Cihanê (WHO) nexweşiya vîrûsa koronayê wekî COVID-19 bi nav kir. Tê texmînkirin ku ev vîrûs ji ajalekê derbasî merivan bûye lê hêj nayê zanîn ka kîjan ajal e. Vîrûs di demeke kin de derketê derveyî bajêr û niha li 40 welatên cihanê hatiye dît. Her çiqas di vê vîrûsê de li gorî yê berê rejêya mirinê (2-3 %) kême be jî zûtir belav dibe. Heta niha bi nêzî 80 hezar kesî re ev vîrûs hatiye dît û jî wan derdora 2 hezar 800 kesan jiyan xwe ji dest daye. Ji ber vê yekê tirs û xofeke mezin ketiye nav

Vîrûsa koronayê hat ber derî

hemû gelên cihanê.

Li gorî daneyên di destê me de vîrûsa koronayê bi hilmgirtinê û bi destan jî dev, çav û pozê me re dikeve laş û diçe li qirikê bi cî dibe, li wir xwe zêde dike û derbasî pişikê dibe. Derdora 14 rojan di kurîkê de dimîne û dûre dibe sedema nexweşiyê. Vîrûs li ser kesên ku pergala wan a xweparastinê lawaz in zêdetir bandorê dike. Ên nexweşiyên domdar (kronîk) bi wan re hene, zarok, ên kal û pîr, ên tîra xwe nikarin xwarin û vexwarinê bigrin ango ên xizan nexweşiyê girantir derbas dikin an jî dimirin. Kesên ku heta niha mirine jî zêdetir ev kes in.

Rayedarên dewletan carna jî ber kêmasiyên carna jî ji ber berjewendiyên xwe raya giştî bi awayekî durîst agahdar nakin. Ji ber vê li ser tora civakî û di nav gel de gelek go-

tinên eletewş û duri rastîyan digerin. Senaryoyên bobelatên mezin tenê çêkîrin. Ev gotin û senaryo di demeke kurt de digihêjin gelek kesan. Di rewşên wiha de agahiyên xelet tirs û xofa civakê zêdetir dike û nahêle civak meselê têbigihêje û tedbirên xwe bigire.

Di rewşên awarte de di nav gelên bindest de tirs û xof zêdetir e. Ji ber ku xwe neçar û bêxwedî dibînin. Ew jî baş dizanin ku ên politîkayên înkâr û bîşaftinê li ser wan dimeşînin wê tu car derdê wan derman nekin. Ji ber vê divê gelên bindest bi taybetî jî di rewşên awarte de karibin kul û birînen xwe bipêçin û ji heqê xwe derkevin. Sazî û dezgehên civakî divê vê meseleyê demildest tîxin rojava xwe, li ser bisekinin û ji bona pêşîlgirtinê gotin û pêşniyarên xwe ji gel re

parve bikin. Her wiha divê hemû kurdistanî jî bi baldarî nêzikî meseleyê bibin tedbirên xwe bigrin, rê û rêbazên xweparastinê hîni bibin.

Vîrûsa koronayê çend roj berî niha li Îranê jî hate dît û ji ber nexweşiyê heta niha li Îranê bi dehan kesan jiyan xwe ji dest daye. Her wiha li başûrê Kurdistanê jî ev vîrûs hatiye tespîtkirin. Her roj bi hezaran kes jî Îranê derbasî Wan, Agirî û Colemêrgê dibin. Divê demildest çûnê hatin bihata qontrolkirin, gel bihata hişyarkirin û tedbir bihata girtin lê mixabin ev yek derengî ket û encax di roja 4 an de pêk hat. Heta niha rayedarên dewletê gotin hîni wan bajaran di tu kesî de vîrûs nehatiye dît. Lê dibe ku rojên pêşê bêtir dît. Ji ber wê jî divê her kes hişyar be û xwe biparêze.

Vîrûsa koronayê di xwezayê de diji û piştî hinek guherînên genetîk ango mûtasyonan formeke nû derdikeve holê. Bûjenên kîmyewî, radyasyon, dermanên ku beredayî tîne bikaranîn, rûxandin û eşandina xwezayê û hwd. dibe sedema mûtasyonan. Modernîteya kapitalîst merivên wekî hûtan diafirîne. Têr nabin, xwezayê tarumar dikin û ji bo ku zêdetir dewlemend bibin çî derdikeve ber wan dihêrin. Ji bona asêkirina mûtasyonan hewce ye feraseteke xwezapêzê bê rûniştandin û derman bi aqilane bînkaranîn. Wisa tê texmînkirin ku wê vîrûs heta demeke din jî di nav gel de belav bibe û wê hejmara miriyan zêdetir bibe. Hîni tedawî û parza(aşî) nehatine dît. Xebatên zanyaran didomin. Parza were dît jî heta demeke dirêj encax dê bê bikaranîn.

ME DU ŞOREŞ BI HEV RE DAN MEŞANDIN**Herî zêde dayikan ziman parastiye**→ **Ersîn Çaksû**

Vê hefteyê Berdevka Komîteya Perwerdeyê ya Kantona Qamişloyê Menan Mihemed Emîn û Endamê Komîteya Perwerdeyê ya Kantona Qamişlo Goran Şakir mêvanê xwendevanên hêja yê Xwebûnê ne. Me der barê rewşa perwerdeyê li rojavayê Kurdistanê ev hevpeyvîn çêkir, fermo em bi hev re li pirs û bersivan binêrin.

Piştî şoreşa Rojava we dest bi perwerdeya kurdî kir û ev 8 sal in perwerdeya kurdî tê dayîn. Ji ber ku li vê derê perwerdeya kurdî qedexe bû, em dixwazin vê pirsê ji we bikin: we çawa dest bi perwerdeya kurdî kir?

Menan Mihemed Emîn: Ligel şoreşa Rojava, me dest bi şoreşek din kir. Ew şoreş jî, ji bo me şoreşa perwerdeya zimanê dayikê bû. Me xwest em du şoreşan bi hev re bimeşînin. Beriya her tiştî me fêrbûna zimanê dayikê dest pê kir. Pir astengî hebûn, lê me xwest em pêşiyê kesên ku bikarin vî karî bimeşînin derxin holê. Me bi fêrbûna tîpan dest pê kir. Paşê hêdî hêdî em derbasî dibistanan bûn. Yek, du, sê û wisa me dibistan bi dest xistin. Ji ber ku wê demê rejîm hê li ser xwe bû. Wisa hêsan nebû ev kar. Mamoste hîna yên rejîmê bûn, sîstem, sîstema rejîmê bû. Me hewl da em zimanê xwe derbasî dibistanan bikin. Me qîflê dibistanan şikandin û em wisa derbasî dibistanan bûn. Rojên zehmet bûn, lê belê israra me mezîna bû. Piştî êdî sal bi sal me gavên xwe mezintir kirin.

Mamoste, ji bo we, ew şikandina kilîdên deriyê dibistanan xwedî wateyê çawa bû?

Goran Şakir: Astengiya me ya herî mezîna ew bû ku, zimanê me li vê derê bi her awayî hatibû helandin, bişafîn û tûkîkirin. Rast e me ji ziman fêrbûnê dest pê kir, lê belê ev ne bes bû. Me dixwest êdî em zimanê xwe, çanda xwe, folklor û dîroka xwe bi zimanê xwe fêr bibin. Ew hesret di dilê her kesî de bû. Şoreşa Rojava jî, ji bo vê hesretê sersebebek pêgihîştin û pêkanîna wê hesretê bû. Pêşengiya şoreşa ziman mamosteyên me yên jin kirin. Piraniya mamostên me jin bûn. Yên ku ew kilîdên dibistanan şikandin jî disa mamosteyê me yên jin bûn. Mesela dema mamosteyê me diçûn gundekî, gundî hemû bi wan re diçûn deriyê dibistanan dişikandin perwerdeya kurdî didan dest pê kirin. Wekî ku hemû li benda rojek wisa bûn. Pêşiyê mintiqên biçûk dest pê kir, paşê jî bi firehbûna şoreşê, şoreşa perwerdeya zimanê dayikê jî fireh bû. Her kes bi dilşewat nêzik dibû. Tiştê ku sedan salan jê mehrûm mabûn, lê ji bo wê mehrûmiyetê bidin aliyekî derfetek çêbûbû. Sedema serkeftina pergala me ya îro jî bingeha xwe ji wan rojan digire.

Beriyê şoreşê ez ne şaş bim hinek ji we veşarî perwerdeya zimanê didîtin?

Goran Şakir: Belê, rast e. Mesela beriya şoreşê, sala 2011'an me di malan de bi dizîka xwe perwerde dikir. Ew jî pir kêr me yê xwe perwerde dikirin. Piştî şoreşê jî me yekser wekî seferberiyekê jî bo her kesî dewreyên perwerdeya zimanê dayikê da destpêkirin. Ji her beşa civakê û her emrî de insanên me tev li van dewreyan dibûn.

Herî dawî we digot 'me di nav demê de



pergala perwerdeyê ava kir.' Gelo we di avakirina pergala perwerdeyê de çi esas girt, yan jî wiha bipirsim; we xwest li ser kîjan hêmanan bimeşin?

Menan Mihemed Emîn: Beriya ku derbasî bersiva wê pirsê bibim, dixwazim tiştêkî bêjim. Yê ku zimanê kurdî parast dayik bû. Dema perwerdeya kurdî des pê kir jî dayikan ev wek berpirsiyariyek li ser xwe dîtin. Wek mînak, berê dema zarok diçûn dibistanê, zimanek cuda fêr dibû, derdikete nav kolanê zimanekî cuda re rûbirû bû. Lê belê dema di hate malê zimanê dayikê diaxivî. Dayikan bi çil û bergên xwe be, bi danûstandina xwe be û bi lorikên xwe be ziman heta astekê parastibûn. Ev wateyê pir mezîna e.

Menan Mihemed Emîn: Heke em werin ser mijara sîstemê jî; jixwe me got bi fêrbûna tîpan me dest bi perwerdeyê kir. Piştî ast bi ast em pêve çûn. Lê belê van em tîr nekirin. Tenê fêrbûna ziman tîrê nedikir. Me ev pirs ji xwe kir: gelo em pergaleke perwerdeyê ya çawa dixwazin? Em ghiştin wê baweriyê ku, divê pergala me ya perwerdeyê wek şoreşa me pirreng, pîrziman û pîrçand be. Ji bo wê jî me pergala xwe spart neteweya demokratîk.

Menan Mihemed Emîn: Me li ser vê esasê mufredata xwe, ji refa yekan heta refa 11'an amade kir. Me tenê zimanê kurdî esas negirt, zimanê dayikê pêş xist. Kurd, bi kurdî, ereb bi erebî, suryan bi suryanî fêr dibin. Me hemû materyalên xwe bi wan sê zimanan amade kirin. Niha dema zarok dest bi dibistanê dike, heta refa 3'yan tenê zimanê dayikê fêr dibe. Dema derbasî refa 4'an dibe êdî zimanê din ê cîran lê zêde dibe. Kurd, bixwaze erebî yan suryanî fêr dibe, ereb bixwaze kurdî yan suryanî fêr dibe. Ev jî bo suryanan jî derbasdar e. Li gor xwestekê ye. Dema zarok derbasî refa 5'an dibe, wê demê perwerdeya zimanê biyanî jî lê zêde dibe.

Menan Mihemed Emîn: Li aliyê din komîteya me ya amadekirina materyalan heye. Ew komîte her sal perwerdeyê dişopîne, kêmasî û zêdegaviyên di perwerdeyê de tespît dike û di materyalan de li gor wê sererastkirin tîrînin. Her wekî din di nav salê de mamoste jî raporên xwe yên der barê materyalan de dişînin û li gor wê pirtûk û materyalên perwerdeyê di ber çavan re tîr derbasîkirin. Mesela îsal ji aliyê rêveberiya xweser ve hemû materyal hatin çapkirin û ghiştin hemû dibistanên Bakû û Rojhilatê Sûriyeyê.

Di salên borî de li ser mufredatê hinek nîqaş çêbûn. Lê belê îsal ew rexne hema bêje qet nebûn. Em dikarin bêjin di vir de êdî rêkûpêkbûnek çêbûye?

Goran Şakir: Belê, rast e dema mufredata nû derket, ji gelek aliyên ve gelek rexneyên cuda hebûn. Ew rexne hinek di cih de bûn. Ji ber ku tecrûbeyek me zêde nebû. Li aliyê din mufredata berê ne li gor çand, folklor û dîroka me bû. Ew rejîmê li gor xwe amade kiribû. Bingehê ku em xwe bispêrinê û pirtûkên perwerdeyê amade bikin nebû. Piraniya kêmasiyan di wir de derdiketin. Lê belê hinek rexne jî siyasî bûn. Kêmasiyên aliyê perwerdeyê û rêbazê de heta asteke baş hatin çareser kirin. Materyal û pirtûkên îsal hatin çapkirin niha xwediyê asteke baş in û hema bêje qet rexne jî li ser nîn in. Em dikarin bêjin tecrûbeyek baş çêbûye.

Niha li Bakû û Rojhilatê Sûriyeyê, gelek herêmên wek Reqa, Dêra Zor û Tebqa hene ku piraniya pêkhatiyên wê ereb in. Li van deveran nêzikatiya xwendekar û malbatan a li hember pergala we ya perwerdeyê çawa ye?

Goran Şakir: Ev mijar tenê girêdayî perwerdeyê nîn e. Girêdayî sîstema giştî ye. Dema YPG'ê û HSD'ê ev dever ji çeteyên DAİŞ'ê rizgar kirin, jixwe baweriyek avabû. Li ser vê sîstema perwerdeyê pêş ket. Bi rastî baweriyek çêbû. Yanî sîstem li kesî nehat ferzkirin. Wan deveran jî sîstem wekî sîstema xwe dîtin û pejirandin.

Goran Şakir: Tevî van tiştên em dibêjin êdî her kes çareserî û rizgariyê di perwerdeyê de dibîne. Eger em li rastiyê vegehin sedemê şerê Sûriyeyê ye ku sedhezaran insan canê xwe jî dest da û ev perçebûna Sûriyeyê jî perwerdeya şaş bû. Eger yekperestiyek li ser gel nehatiba ferzkirin, îro Sûriye di vî halî de jî nedibû.

Li her parçeyek Kurdistanê zimanek cuda li ser kurdî hat ferzkirin, wek erebî, tirkî û farsî. Li Rojava jî zimanê serdest erebî bû. Lê piştî şoreşa Rojava vaqiyetek nû derket holê. Gelo hûn jî kurdî li ser pêkhatiyên din ferz dikin û dibêjin zimanê serdest kurdî ye, yan na?

Goran Şakir: Me xwe spartiye sîstema neteweya demokratîk. Pergala perwerdeya me çawa ye, hevala me jixwe behs kir. Ji bo pîrsa we jî em dikarin wiha bersiv bidin: kesê/a ku tiştê nexweş hatiye serê wî/ê wê yekê nayê serê kesê din. Em wê êşê baş dizanin û em nahêlin kes wê êşê bibîne. Ji ber wê çendê her kes zimanê xwe fêr dibe û bi zimanê xwe fêr bibe.

Mamoste salane serdestan digot kurdî nîn e; paşê gotin kurdî heye perwerdeya wî nabe; piştî gotin perwerdeya zimanê dayikê dibe lê perwerde bi kurdî nabe. Ango îdia dikirin ku perwerdeya ilmî, bi kurdî nabe. Gelo tecrûbeyê we ya 8 salan çi nîşan dide. Bi kurdî dibe yan nabe, kurdî tîr dibe yan tîrê nabe?

Menan Mihemed Emîn: Em bi kurdî û kurmançî bibersivîn. Dibe û pir jî baştir dibe. Û tîrê dibe û hêja ye jî... Destpêkê bi rastî jî astengî hebûn. Em bi xwe di vî warî de bêtêcrûbe bûn. Lê belê ev nayê wê wateyê ku kurdî zeyîf e. Yê zeyîf em bûn. Niha astek çêbûye. Em nikarin kêmasiyên xwe li zimanê kurdî bar bikin. Kurdî zimanekî pir û pir dewlemend û xwedî dîrok e. Em di wê hêvî û baweriyê de ne, di nav demê de zimanê kurdî wê gavên mezintir jî biavêje.

Mamoste beriya çend salan her tim digotin kurdî di nav lîsteya "zimanên di bin metirsiya tunebûnê de" ye. Lê belê niha tê diyar kirin ku li ser kurdî metirsiyek bi vî rengî nîn e. Gelek zimanzan, lêkolînerên ziman dibêjin ku şoreşa Rojava û sîstema wê ya perwerdeyê hêzek mezîna da kurdî, bi taybet kurmançî. Hûn vê yekê çawa dinirxînin?

Goran Şakir: Ji bo bersivandina wê pirsê divê mirov li dîrokê vegere. Dema mirov li dîroka kurdî jî vedigere, ev tişt bi zelalî tê dîtin ku rehên kurdî pir di kîr de ne. Bingehê xwe ya saxlem heye. Tenê çi bûye, astengî li pêşiyê vî zimanî hatine derxistin. Lê belê ev nayê wê wateyê, kurdî tîrê nake û qels e. Ev nayê wê wateyê ku aliyê aborî û civak û zanist û raman de tîrê nake. Bi şoreşa Rojava dema em careke din li xwe û zimanê xwe vegeherin me dit ku ji aliyê jêderan ve hinek astengî hene. Lê me dit ku; ne ku ew jêder nîn in, hene lê hatine veşartin. Ji aliyê sîstemê serdest ên zilmar ve hatibûn veşartin. Bi şoreşa Rojava re her roj, ev jêderên hatibûn veşartin, derdiketin û qewîn dibin. Ev yek jî her roj ziman dewlemend û xurtir dike. Em nabêjin her tiştê tamam e, lê belê herî kêrê li ber qirkirina ziman hatiye girtin. Lê hê jî rêyêke dirêj li pêşiyê me ye...

We di kurdî de tîpên latîni esas girtin...

Goran Şakir: Rast e. Ji ber ku ji bo kurmançî tîpên herî rehet tîpên latîni ne. Perwerdeya erebî jixwe bi tîpên aramî tê dayîn. Dema ku xwendekarek jî dibistanê me derdîçe, herî kêrê sê alfabe û du zimanan fêr dibe. Ev jî dewlemendiyeke e.

Di pergala we ya perwerdeyê de li gor we tiştê kêmmayî çi ye?

Menan Mihemed Emîn: Niha li gor şert û mercan pergalek baş rûniştîye. Lê belê disa jî divê stratejiyek me ya demdirêj a perwerdeyê hebe. Di wî warî de hinek gav hene lê hîna tam negihîştine encamê. Ji ber ku gavên me yên destpêkê mehelî bûn. Me kêmasiyên wan zû didîtin. Lê belê niha êdî yekser dîtina kêmasiyan zehmet e. Divê stratejiyek demdirêj hebe ku em bikaribin pêvajoyek li ser hîmek saxlem ava bikin.

Mamoste em heman pirsê jî we jî bikin...

Goran Şakir: Ez jî tev li gotinên mamoste Menan dibim. Lê belê xeyaleke me ya wiha heye: Em bikarin zaravayên kurdî yên din jî di vir de di akademi û zanîngehan de bidin fêrkirin. Mesela di zanîngeh û akademiyan de beşên soranî, kirmançî û hewramî hebin wê pir baş be. Di vir de fikrek û projeyek jî heye. Hinekî rewşa me ya siyasî baş bibe, şer jî ber deriyê me biçê, avêtina van gavan ne zehmet e.

Ziman û Raman

Sami Tan



Rêziman û xebatên rêzimanî

Rêziman rêz û rêçikên zimanekî nişan didin. Heke em wateya wê ya ferhengî binivîsin, em dişên serî li Ferhenga Têgehên Rêzimanî ya di Zimannasiyê da ya R. L. Trask bidin ku dibêje: “1. Pergala ku pê peyv û morfemên zimanekî digihêjin hev û yekeyên mezintir, bi taybetî jî hevok û risteyan pêk tînin. 2. Şayesandin û ravekirina vê pergala ku ji komek rêgez û rêzikan pêk tê. 3. Ev beşa zimannasiyê ya ku bi danîn û avakirina ravekirinê û vekolana pêkhênerên zimanî.”

Bi awayê ku hevaleyê berî salan gotibû, “rêziman notaya zimanî ye”, mirov dişê bêyî zanîna nota jî amûreke muzîkê lê bide, lê heke mirov notayan bizane, hingî karê mirov hêsantir û hunera mirov çêşengtir dibe. Her wekî çawa nota nivîsbarkirîna dangan e, rêziman jî destnîşankirin û birêkûpêkkirina rêgez û rêzikên zimanî bi xwe ne. Mirov nikare li derveyî rêzikên heyî jî xwe li gorî dilê xwe yan jî li gorî zanîna xwe hinek rêzikên li ser zimanî ferz bike.

Xebatên rêzimanî du cure ne; rêzimana şayesî û rêzimana rêzîkparêz. Di rêzimana şayesî da bi rêzikên di zimanê heyî (li ber dest) da xebatên li qadê tîr diyar kirin û li ser wê bingehe berhemên rêzimanê tîr amadekirin. Di rêzimana rêzîkparêz da li gel rêzikên di zimanê heyî da, bi nêrîneka dûndemî (diyakronîk), li ser rêzikên heyî xebat tîr kirin, hewla pêkanîna zimanekî petî û rewan tê dayîn. Di encamê da jî hinek form wekî rast, hinek jî wekî çewt tîr binav kirin û berhemên rêzimanê li ser bingeha rêzikên rast tîr nivîsandin.

Dema ku em bala xwe didin xebatên rêzimana kurdî, em dibînin ku xebatên ku bi destê kurdan hatine kirin, bi piranî bi nêrîneke rêzîkparêz hatine kirin. Palpišta rêzimanasên kurd bi piranî paşxaneya wan a zimanî ku jêderka wê jî devoka wan bi xwe ye. Ji bilî wê jî hinek xebatên nivîskî ne, ku berî wan hatine kirin. Li bakurê Kurdistanê palpišta gelek rêzimanîvanan xebata Celadet Bedirxan û Roger Lescotî ye. Lê kesî zêde bala xwe nedaye xebata Qanatê Kurdo, Sadip Bahaedîn Amêdî, Reşîdê Kurd.

Her wiha kêman kesana bala xwe daye xebatên li ser rêzimana kurmançî yên ku bi zimanê îngilîzî, almanî, frensî, erebî û farisî hatine nivîsandin. Dişa, kêman kesana xebateke berawirdî li gel rêzimana van zimanan û rêzimana kurmançî kiriye. Piraniya kesên ku di warê rêzimanê da berhem dane, herî zêde di bin bandora rêzimana tirkî da mane. Hinek ku derçûyê medreseyan in, belkî hinekî jî rêzimana erebî û farisî sîd wergerîtin.

Lê îro dem hatiye ku nişên ku hêdî hêdî xwe jî vê rewşê rizgar bikin, li gorî teoriyên nû yên zimannasiyê berê xwe bidin kurdî, gotar û pirtûkan di vî warî da binivîsin. Ne pir zêde be jî hinek xebatên bi vî rengî hene. Îro çend kovarên akademîk di warê zimannasiyê da derdikevin. Ev yek cihê kêfxweşî û şanzazî ye.

Em hêvî dikin ku xebatên der barê rêzimana kurdî da êdî çarçoveya rêzimana klasîk derkevin, zêdetir li gorî teoriyên nû û nûjen ên zimannasiyê û piştî xebateke berfireh a li qadê werin kirin. Bi vî yekê dê gelek formên winda yên rêzimana kurdî derkevin holê û zimanê nivîskî yê kurdî dê bi van formên nû xurttir bibe.



Mizgîn Rêwî

Şeveke zivistanê bû. Berf, ba û bahoza bû, mirov jî sermayê diqefilî. Kesekî nediwêribû ku serê xwe derxe derve. Fîzefîza ba û dengê guran tevlihev dibû û tarîtiyê jî xofek dixiste dilê mirov.

Tevahiya şevê berf barî û ewqas pir barî ku heta devê şibakê hatibû. Zarok di nav nivînan de ji tirsan qet xwe nedilivandin. Dayika wan di nav nivînên xwe de rûniştibû hîskehîska wê bû bêdeng digiriya. Ji neçariya xwe re jî bêkesiya xwe re û ji tenêtiya xwe re... Ev çend meh bûn hevjinê wê tunebû nizanibû ka li ku derê ye, sax e an miriye nizanibû.

Dengê bayê sekinî û dawî li dengê guran jî nedihat. Berf sekinibû jî bilî dilê bi êgir jî bilî qêrîna heşt dilên belengaz tevekî deng sekinibûn. Hêstirên jî xwîndê dibarandin ser balgiyên xwe. Dayika wan nexweş bû nedikaribû rabe ser xwe û ne jî dikaribû zarokên xwe jî xewa şîrîn şiyar bike. Agirê di dilê wê de jî êşa laşê wê re serdest bû wek gunehkarekî di dojehê de laşê wê bişewite bibe kozere û cardin bişewite wisa bêdawî bû kesera wê. Lê diviyabû serê xênî were textkirin da ku

Veger

Agirê di dilê wê de jî êşa laşê wê re serdest bû wek ku gunehkareke di dojehê de laşê wê bişewite bibe kozere û cardin bişewite wisa bêdawî bû

dilop li malê neqelibin. Dema berf dihelîya av di nav terkan de diherîkî û xênî dilop dikir. Dayikê jî neçarî deng li lawê xwe kir;

“Lawê min ka rabe xwişka xwe û birayê xwe rake herin ser xênî, berfê paqij bikin.

Lawê wê şiyar bû zûka rabû ser xwe kincên xwe li xwe kir gazî xwişk û birayê xwe kir, ew jî rabûn ser xwe kincên xwe li xwe kirin, bi hev re çûn ber derî, derî vekirin çî bibînin berf jî qama wan jî bihuriye. Yê mezin çardeg salî, ya herî biçûk heşt salî du xwişk û du bira derketin derve yê mezin rê vekirin yê biçûk jî dan pey wan çûn serê xênî jî berfê paqij kirin. Di heman demê de şêrê ku di kemînê de dîlgiirtibû li wan difikirî gelo niha di çî rewşê de bûn, çî dikirin. Bi wan sar bû an na, dilê wî dibû heşt parçe gulo kes li wan xwedî derdiket an na. Hê diji û gelo zanibûn hê li binê heman ezmanî ne.

Berf li ser laşê wî dibarî ba û bahoza diqetiyên di nav mejiyê wî de, laşê wî dişewitî di agirê dojehî de. Zarok jî ser xênî hatin xwarê jî sermana qefilîbûn, destê wan tevîzibûn hatin hundirê hêwanê germ bûbû. Sobe vexistî bû agir di devê wê de derdiket derve li erdê sênîyek tije xwarin hebû dayika wan jî bona wan amade kiribû. Li hev nihêrtin li dayika xwe nihêrtin çûn li ser sifrê rûniştin destê xwe dirêjî nan kir lawê mezin lê destê wî neçû nan çû ser rûyê wî. Hêstiran rê nedidanê, nedixwest dayika wî ew wisa bibîne. Di dilê xwe de got ez ê negirîm ez lawê şêran im xwedê tu qewetê bidî min. Dayika wan hat li ber wan sekinî û got:

“Hûn negirîm ez ê jî êdî negirîm min xewnêk dît şêrek di kemînê de dîlgiirtî mabû, berf bi ser de dibarî lê wî her li ber xwe dida.

Dayikê guh nedida berf û seqemê stran digot;

“Bêrxwedan, bêrxwedan jiyan e hey hey, bêrxwedan jiyan e, bêrxwedan jiyan e...”

Di pey re jî ji kemînê difilîti şîret li zarokên xwe dikir û digot dê sibê rojek xweş û ronî be, de îcar nanê xwe bixwin û razên. Zarokan jî wan gotinan hêzek girtibû nanê xwe xwarin û ketin nav nivînên xwe û razan. Serê sibehê zû rabûn çûn ber şibakê li derve nihêrtin dengê zîlam û jinan dihat derketin ber derî nihêrtin wa zilamek li pêşiya wan e û tê wekî şêrek birindar dikule. Lê li ser piyan e û serbilind e bi heybete şêrekî tê û dikeve hundir. Dayika wan hêz dide xwe radibe lê li ciyê xwe dicemide. Ev zîlam jê re nas tê lê gelo bi rastî jî ew e an na di dilê xwe de dibêje;

“Rast e ew e lê pir guheriye.

Ber bi zarokan wê tê zarok wî nas nakin di cihê xwe de dicemidin. Nizanin ka çî bikin lê baş fêman dikin ku pir bi siûd in bavê wan vegeyabû.

Di salên heştêyî de, piştî darbeya dozdehê îlonê xelkê bakurê Kurdistanê jî ber êrişên dewleta tirkî jî bêderfeti pêl bi pêl dev ji mal, milk û gundên xwe berdand û ber bi welatên Ewropayê ve koç kirin. Bi taybetî jî kurdên êzîdî koç kirin. Zordariya ku li kurdên êzîdî dihat kirin, du qatê zordariya li kurdên misilman bû. Ne tenê ji aliyê dewleta tirkî ve, her wisa zilm û zordariya ku ji aliyê kurdên misilman ve li êzidiyan dihat kirin, nayê gotin...

Dema em ji gundê xwe derketin, ez ne biçûk bûm û ne jî mezin. Ez di temenekî wisa de bûm ku ez bibim sedsalî jî, ez ê biranînen wê demê ji bir nekim.

Gundê me gundekî xwerû êzîdî bû, tenê xwendegaha destpêkê (seretayî) lê hebû. Xwendegaha navîn li bajarokê nêzî gund bû. Şênîyên bajarok hemû misilman bûn.

Êzidiyan jî tirsî misilmanan newêrabûn zarokên xwe bişînin xwendegaha navîn a li bajêr. Bi taybetî jî zarokên keç, ji ber tirsî ku ew direvandîn û dikirin misilman, ji ber vî yekê keçên êzîdî tenê xwendegaha seretayî li gund dixwendin.



Ez bihitîm...

Asya Xerzan

Dewleta tirkî bi sedan mal û gundên kurdan şewitandin, bi hezaran kurd derbeder kirin. Hinek ji wan çûne metropolên Tirkîyeyê û hinek çûne Amerîkayê û hinek jî çûne Ewropayê, hema li seranserê dinyayê kurd belav bûn.

Piraniya kurdên êzîdî jî xwe li welatê Almaniyayê girtin.

Li Almaniyayê gava malbatên êzîdî serî li penaberiyê didan, di demekî kin de dadgehên wan vedibûn, gotinên xwe kêman zêde digotin, serlêdana wan a penaberiyê dihat pejiwandin û di nav çend salan de jî dibûne hevvelatîyên Almaniyayê.

Ev jî babeteke bi serê xwe ye, yek jî planên hevalbendên dewleta tirkî û pişaftina kurdên êzîdî bû. Lê niha mijara min tişteki din e.

Serlêdana penaberên kurdên misilman ji bo mayîna li Almaniyayê bi hesanî nedihate

pejiwandin.

Ji bo ku mafê rûniştinê û hemwelatîya Almaniyayê bistînin, divê êzîdî bûna.

Li gor baweriya êzidiyê kesekî jî dê û bav ne êzîdî be, nabe êzîdî.

Lê bi her awayî pêşimamê êzidiyan bi mora xwe ya êzidiyê li misilmanên kurd xwedî derdiket, xêr û gunehê wan dikire stukra xwe û ew helal dikirin.

Wan jî bi derewîn ola êzidiyê qebûl dikir û bi vî hawî hemû heq û hiqûqên mafê mayîna xwe li Almaniyayê bi dest dixistin.

Ez werim ser mijarê:

Dema ez çend roj berê wek guhdar beşdarî dadgeha koçberêkî îrani bûm û min derewên wî guhdar kirin, ez bihitîm... û hema hindik mabû, ez rabim û bêjim, tu derewan dikî...

Hemû tecawizkar, dizek, mêr-

kuj û xirabên dewletên ereban (misilmanan) hatine welatên Ewropayê, yek jî wan jî herî zêde dewleta Almaniyayê ye.

Mirovekî temenê wî 30 salî ye. Heta 25 saliya xwe, li gorî rîya îslamê jiyaye, çîye mizgeftê, quran xwendiyê û li Tehranê melatî kiriyê. 5 sal in li Almaniyayê diji û dixwaze li Almaniyayê bimîne, piştî çend caran reda wî tê û nayê qebûlkirin. Vê carê jî biryar dide, ola xwe biguherîne, bibe xiristiyan.

Diçe dêrê, incîlê dixwîne, xwe fêrî hemû dua û cejnên wan dike...

Serê gotina xwe, binê gotina xwe dibêje: Vater Jesus (Îsayê Bav) Gotineke pêşiya: Têjikê mar jî mar e.

Dadgeh û dadwerên alman jî hin caran bi dilnizmiya xwe û jî tirsî navê nedemokrasîyê bi wan keve, tîr xapandin û mafê sekna Almaniyayê didin wan. Piştî ku dibin hevvelatîyên Almaniyayê, li ser navê demokrasîyê mizgeftan vedikin, bi jinên alman re dizewicin, zarokan çêdikin û wan di rîya îslamê de perwerde dikin, heke na, wan berdidin û wan bi tenê dihêlin...

Di nav geşedanên dîrokî de kongreya HDP'ê

HDP'ê di kongreyê de zimanek, stratejiyek û polîtîkayek nû da ber xwe. Hemû pirsgrîkên aborî û civakî di vê qonaxa nû de, li ber HDP'ê ne. Di serdema nû de jî dê siyaseta aştîyê wek siyaseteke bingehîn bidomîne

Navenda Nûçeyan

Li Kurdistan û Tirkiyeyê, geşedanên 4 û 5 salên dawî, bandoreke neyînî li ser atmosfera civakî û siyasî kir. Dozaja êrîşên li dijî qada siyaseta demokratîk, wek metastazê rengvedaneke pasîf li tevahiya civakê jî kir. Geh li Kurdistanê, geh jî li Tirkiyeyê, guhertina pergale û avakirina rejîma nû, peyderpey dozaja êrîşan jî xurt kir. Nemaze ji 2015'an vir ve, di çarçoveya êrîşên li dijî HDP'ê de teqrîben 18 hezar kes bi hincetên curbicur hatin destgîr kirin, jê nêzî 8 hezar kes jî hatin girtin. Hevserok, parlamenter, hevşaredar û rêveberên partiye li dor planeke pergale wek rehînat hatin girtin, hemû destkeftiyên kurdan û şaredarî hatin desteser kirin. HDP wek parti nehate girtin lê hemû rêxistinên wê bi êrîş û zextên mezin re rûbirû man.

4'emîn kongreya xwe ya asayî ya mezin, 23'yê sibate li Enqereyê, li dar xist. HDP'ê, beriya kongreyê, bi panel, sempozyûm, konferans û çalakiyên curbicur, kêşeyên civakî

û siyasî bi hemû pêkhate û hevalbendên xwe re nîqaş kirin. Encamên wan çalakiyan, bandora xwe li ser naverok û bernameya kongreyê jî kir. Encamên 4 û 5 salên dawî ên pêvajoya şer û pevçûnê bi hemû deyatên xwe hatin nîrxandin, bergirî û tevdirên pêwîst hatin nîqaş kirin.

Pêdiviyên pratîk aşkera bûn

Di nav geşedanên dîrokî yê li Rojhilata Navîn, Kurdistan û Tirkiyeyê de, ligel êrîş û zextan, hem pêkanîna kongreyê, hem jî naverok û atmosfera wê, careke din pozîsyon, îdia û aktorbûna HDP'ê muhkem kir. Ji bajarên kurdan heta yê tirk, ji Tûnisê heta Fas û Urîdînê, ji welatên Ewropayê heta başûr û rojhelatê Kurdistanê, ji 28 welatan partî, rêxistin, sazî û kesayet beşdarî kongreyê bûn. Balkêş bû ku piştî berberiya di navbera dewleta tirk û dewletên ereban de, cara ewil ji welatên erebî, ewqas kes, rêxistin, partî û nûner beşdarî kongreya HDP'ê bûn. Kongreya HDP'ê li gorî karakterê HDP'ê ye pirreng, pirdeng encam da. Ji yekitiya neteweyî bigire heta piştevaniya navneteweyî, daxwaz, bang û pêdiviyên pratîk careke din aşkera bûn.

Kongre bi awayekî serkeftî û bi coşeke mezin bi dawî bû. HDP'ê hevserokên xwe yê giştî û endamên meclisa xwe ya partiye li gorî bernameya xwe û rêzîknameya xwe nû kir û rûpeleke nû li dîroka xwe zêde kir. Pervîn Buldan û Mîthath



Sancar wek hevserokên nû hatin hilbijartin. Helbet îro şepêla siyaseta popûlîzmê û bayê liderên karîzmatîk bandora xwe li tevahiya siyaseta cihanê dîke. Di atmosferêke wiha ya siyaseta popûlîzmê û di nav nakokiya ve rastiyê de HDP'ê Mîthath Sancar û Pervîn Buldan wek hevserokên nû bijart. HDP li dijî ve bayê siyaseta popûlîzmê ya bandora xwe li tevahiya cihanê kiriye, avakirin, û bipêşxistina mekanîzmayên sazûmanîyê û karîgerkirina rê û rêbazên demokratîk û pirreng/pirdeng derdixe pêş. Lewre mirov dikare hevserokatîya Mîthath Sancar di ve çarçoveyê de binirxîne û projeksiyona siyaseta qonaxa nû fehm bike.

Der barê kongreyê de lêpîrsin
Kongreya HDP'ê bi dawî bû, lê

êrîşên beriya kongreyê dest pê kiribûn, piştî kongreyê jî dewam kirin. Beriya kongreyê ji 200 kesan zêdetir xebatkar û endamên HDP'ê yê ku xebat û amadekariya kongreyê dikirin, hatibûn destgîr kirin. Hem atmosfera kongreyê hem jî naverok û psikolojiya wê Erdogan û Bahçelî aciz kirin û piştî kongreyê Serdozgeriya Enqereyê der barê kongreyê de lêpîrsin da destpêkirin; xebatkarên teknîk û berpîrsên HDP'ê jî di nav de 15 kes binçav kirin. Atmosfera kongreyê hikmê dewletê ye di 4 û 5 salên dawî de li ser siyaseta civakê ava kiribû, berevajî kir. Careke din aşkera bû ku, çendîn xebatkar û berpîrsên HDP'ê bûn girtin jî, rastî her celeb zext û pêkutiyên bê jî, rêxistina xwe careke din vesaz û birêkûpêk dîke.

HDP'ê kongreya xwe bi awa-

yekî serkeftî li dar xist, rêveberên xwe nû kirin û dest bi qonaxa nû kir. Di vê qonaxa nû de, HDP'ê zimanekî nû, stratejiyêke nû û polîtîkayêke nû da ber xwe. Ji meseleya kurd bigire heta kêşeyên Tirkiyeyê, ji siyaseta şer bigire heta avakirina aştîyê, hemû pirsgrîkên aborî û civakî di vê qonaxa nû de, li ber HDP'ê ne.

Axaftina hevserokê giştî yê HDP'ê Mîthath Sancar, wek bange-waziyeke xurt a aştîyê bû. Di navbera axaftina wî de şifreyên serdema nû û polîtîkayên nû xwe dida der.

Helbet HDP ne tenê îro, di 8 salên dawî de, her û her siyaseta aştîyê wek siyaseteke bingehîn dabû ber xwe û li gorî wê siyaseta dikir. Di serdema nû de jî dê ve siyaseta xwe bidomîne.

Êdî ji rejîma Îranê bawer nakin

Li Îranê 21'ê sibate hilbijartina parlamentoyê pêk hat. Wezîrê Karên Navxweyî yê Îranê Ebdulrizza Rehmanî Fazlî ragihand ku di hilbijartina Îranê de 24 milyon û 512 hezar kesan deng bi kar anî û tevlibûn ji sedî 42,57 e. Lê aliyên muxalefê berevajî daxuyaniya fermî diyar kirin ku rêjeya tevlibûnê bi qasî ji sedî 20 pêk hatiye.

Li gorî salên borî rêjeya tevlibûnê ya îsal pir kêmtir bûye. Li rojhilata Kurdistanê piranî aliyên kurd ên muxalîf hilbijartin bojkot kirinbûn.

Bandora serhildanan

Serhildanên di zivistana 2018 û payîza 2019'an de li tevahiya Îran û rojhilata Kurdistanê pêk hatî bandora xwe li hilbijartinê jî kir. Serhildanên ku pêk hatin ji bo Îranê pêvajoyêke nû û destpêk bû.

Her wiha rejîma Îranê xwest ku kuştina Qasim Silêmanî bike semboleke mezhebî û neteweyî di nav civakê de pêş bixin û di hilbijartinê de jî bi bandor bin. Lê belê ev tişt bandora xwe li hilbijartinê nekir û tevlibûn kêmtir bû.

Kêmbûna tevlibûnê ya hilbijartina îsal pêk hatî tenê bi krîza aborî nayê îzah kirin. Ji ber ku îro li Îranê rejîm û baskên rejîmê meşrûiyet û baweriya xwe wenda kir. Gelê rojhilata Kurdistanê bertekên xwe li hemberî rejîmê bi bojkotê anîn ziman û bi ser ketin. Hilbijartina îsal îspat kir ku êdî rewabûna rejîma Îranê di nav li cihan û welat nemaye. **TEHRAN**

Pêşmerge dê veşerîna deverên xwe

Piştî şerê navxweyî yê navbera Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) û Yekitiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK), ji sala 1993'yan ve li başûrê Kurdistanê lihevkerîna her du aliyan û yekitiya her du îdareyan pêk hatîye. Lê heya niha her du alî xwe-diyê du hêzên cuda yê pêşmerge ne û hîn jî yekitiyek pêk nehatiye.

Ji bo yekitiya hêzên pêşmerge hem gelek hewildanên navxweyî

hem jî di asta navdewletî de hevpeyman çêbûn. Lê heya niha ev hewildan bi encam nebûn. Ji ber yeknegirtina hêzên pêşmerge bi bûyerên 16'ê cotmeha sala 2017'an ji sedî 51'yê axa başûrê Kurdistanê jî dest çû. Deverên di bin serweriya Herêma Kurdistanê de careke din ketin bin serweriya hikûmeta navendî. Têkildarî yekitiya hêzên pêşmerge û vegera

hêzên pêşmerge ji bo deverên ji herêma Kurdistanê qutbûyî, şewirmendê leşkerî û ji Wezareta Pêşmerge Lîwa Rukin Bextiyar Mihemed axivî. Bextiyar diyar kir ku pêngavên ji bo yekitiya hêzên 70 û 80 yê hêzên pêşmerge hatine destpêkirin. Her wiha Bextiyar Mihemed da zanîn, di çarçoveya peşnûmayasaya reforman a hikûmetê de ji bo yekitiya

tevahî hêzên pêşmergeyan dest bi avakirina yekineyan kirine û got: "Tenê lihevkerîna di sala 2009 û 2010'an de pêk hatibû. Lê piştî vekîşîna hêzên Amerîkayê ji Iraqê lihevkerîna ji holê rabû. Ji bo lihevkerîna jî heta niha tiştek nehat kirin. Em li bendê ne ku piştî avabûna hikûmeta nû ya Iraqê, hêzên pêşmerge careke din veşerîna deverên ji Herêma Kurdistanê qutbûyî." **HEWLÊR**

Cîhan ji vîrûsa koronayê re ne amade ye!

Vîrûsa koronayê li nêzî 40 welatan belav bûye. Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) jî bo şewbê hişyarî da û diyar kir, divê cîhan xwe jî şewbê re amade bike.

Vîrûsa koronayê (Covid-19) ku meha kanûnê li bajarê Wuhan ê Çînê li bazareke heywanan derkete

holê, li cîhanê belav dibe. Li gelek welatan tedbîrên cuda hatin wergirtin. Li gorî daneyan li gelemperîya cîhanê zêdeyî 80 hezar kesên bivîrûs hatin tespîtkirin.

Vîrûs roj bi roj belav dibe. Li nêzî 40 welatan belav bûye. Vîrûsa koronayê li Awûsturya, Swîsre, Hir-

watistan, Brezîlya, Yewnanistan, Makedonyaya Bakur, Pakistan û Gurcistan, Îtalya, Fransa, Spanya, Qraliyeta Yekbûyî, Macaristan, Ukrayna, Lûksembûrg, Komara Çekê û Romanyayê hat dîtin.

Vîrûsê li Rojhilata Navîn herî zêde bandor li Îranê kir. Li gorî daneyên fermî li vî welatê bi dehan kesan jiyana xwe ji dest daye. Her wiha tê gotin ku rastî jî hêla dewletê ve tê weşartin. Rayedarên Îranê jî ber şewba vîrûsa koronayê gera nav welat sinordar kir, gelek çalakiyên giştî hatin betalkirin û dibistan hatin girtin.

Her wiha odeya krîzê ya hikûmeta Iraqê jî bo tedbîrên pêşîlêgirtina vîrûsa koronayê biryar da ku dibistan û zanîngeh heta demêkê girtî bin. Wezîrê Tenduristiyê yê Iraqê jî diyar kir ku sinema, çayxane, cafeterya dê girtî bin û bîranîn û şahî jî dê

neyên lidarxistin. Her wiha civînan giştî jî hatin qedexekirin.

Li dijî vîrûsê her welatek tedbîrên cuda werdigire. Çalakiyên ku giştî tîr kirin hatin betalkirin, seferên di navbera bajar û welatan de hatin kêmkirin, dibistan ketin betlaneyê.

Ji ber şewba vîrûsê gelek şirketên rêyên hewayî yê cîhanê 'di rewşeke metirsîdar' de ne. Komeleya Veguhastina Hewayî ya Navneteweyî (IATA) diyar kir ku vîrûs bandoreke neyînî li gelek şirketan kiriye. Rêxistina Hewakariya Sivîl a Navneteweyî (ICAO) bi daxuyaniyek diyar kiribû ku 70 şirketên rêyên hewayî seferên navneteweyî yê ber bi Çînê ve betal kirine. Nêzî 50 şirketan jî seferên xwe kêmtir kirin. Nayê zanîn ku maliyeta vîrûsê wê çiqas be. Maliyeta vîrûsa Sars a navbera salên 2002 û 2003'yan 6 milyar dolar bû. **AMED**



PYD xeta çareseriyê diparêze

Mihemed Seydî

Kongreya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) ya 8'emîn, di 24 û 25'ê sibatê de hat lidarxistin. Kongreye asayî bû lê ne di rewşeke asayî de hat lidarxistin. Dihata payîna ku di meha cotmeha sala 2019'an de were lidarxistin. Lê ji ber rewşa şer û êrişên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê (Girêsipî û Serêkaniyê) hatibû taloqkirin. Dema em behsa PYD'ê dikin, em behsa dîrokeke têt û tîjî ya têkoşîna li hemberî zihniyeteke nijadperest, şovênist û mêjîkerî dikin.

Pêşengên vê partiyê Şilan Baqî û hevrêyên wê di kemînekê de li Mûsilê di 29'ê mijdarê 2004'an de jiyana xwe ji dest da. Ev jî êrişê destpêkê ya li hemberî PYD'ê tê pênasekirin. Ji ber ku damezîrîna wê hatin hedefgirtin. Piştî wê bû destê gelek aliyên êriş û girtin bû çarenûsa gelek endamên pêşeng ên partiyê û encam û armanc ji holê rakirina pêşengan bû.

Wekî Osman Dadelî di bin îşkencê de li zindanên beisiyan, Îsa Hiso bi êrişê ji aliyê mêjîkerîyan ve

û Gul Selmo li Helebê bi destê komên çeteyan hat qetilkirin.

Ev kongre çiqas bi asayî were ziman jî lê dema em bala xwe bidin, ji damezrandina partiyê heta niha rewşa derûdorê ne asayî bûye. Ji ber wê yekê tu partî nikarin wekî vê partiyê têkoşînek di vî astê de bidin meşandin. Bedêlên ewqas pîvanek in. Ev ne pesindayîn e lê dîroka wê ya têkoşîn û berxwedanê van gotinan li ser me ferz dike ku em binîn ziman.

Bi destpêkirina şoreşa rojavayê Kurdistanê de, barê herî giran dîsa ve partiyê girt ser milê xwe. Abid Xelil serokê meclisa Serêkaniyê bû û li hemberî komên çeteyan li Serêkaniyê parastina gelê kurd kir û li wir jiyana xwe ji dest da. Rêya daye pêşiya xwe domand. Ew jî bo demokrasî û yekîtiyê her tim bi îsrar bû.

Em werin ser roja îro û xebatên ku PYD dimeşîne, dîsa barê herî giran li ser milê wê partiyê ye. Ji ber ku ew nasnameya şoreşa Rojava û bakurê Sûriyeyê ye.



Her çend pêşengên vê partiyê û têkoşîna wê bo gelê kurd bû jî lê niha rewşa ku heye pir cuda bûye.

Me kongreya 8'emîn a partiyê şopand, me dît ku êdî asta wê ji partiyekê kurdî derbas kiriye. Gelek endamên wê yê ereb û suryan jî hene. Heta dirûşma wê jî bi sê zimanan hatibû nivîsandin.

Lê li derve çima PYD hîn xwedî nasnameyê kurdî maye û li gorî xebata ku niha dide meşandin (ji bo hemû gelên herêmê) nikare xwe ji vê nasnameyê xilas bike. Me ji hevserokên giştî partiyê yê berê birêz Şahoz Hesên û yê nû birêz Enwer Muslim pirsî. Her duyan jî bersiva “Ew kêmasiyek e ku

heta niha nikaribûn derbas bikin. Lê di kongreyê de li ser vê xalê em sekinîn. Êdî li gorî merheleya nû û nasnameyê ku bi armanca Sûriyeyê wekhev ku mafê hemû gelan diparêze û navendî bixebitîn. Em ê deriyê her kesî bixin ku dawî li aloziya li Sûriyeyê jî were. Lê armanca herî esasî jî bidawîna li dagirkeriya li ser axa Rojava û vegera kesên e ku ji cih û warê xwe wan hatine derxistin e.”

Bi minasebata ve kongreyê bi hêviya serkeftinê, yekitiya navmala kurdî û demokratîbûna Sûriyeyê em jî lidarxistin û kongreyê di sêrê de gelê kurd û tevahî gelên li Sûriyeyê pîroz dikin. Ji ber ku xeta PYD'ê tenê rêya xilasîya jî ve krîzê ye.

Divê parêzer biçin Îmralityê

Di 27'ê sibatê de li grava Îmralityê ku Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan lê girtî ye, şewat derket. Şewat li qada bi darên çamê û zeytûnan lê hebûne bi bandor bibû. Ligel Abdullah Ocalan, Omer Hayrî Konar, Veysî Aktaş û Hamilî Yildirim jî li girtîgeha Îmralityê girtî ne.

Piştî agahiya şewatê Buroya Hîqûqê ya Asrînê daxuyaniyek da û diyar kir ku ew bi fikar in û wiha hat gotin: “Di 27'ê sibatê de wezîrê karên hundir di weşana zindî ya TV'an de bi raya giştî re parve kir ku li girava Îmralityê şewat derketiye. Weke ku têt zanîn, girava Îmralityê di sala 1999'an de li dijî muwekilên me birêz Ocalan weke girtîgeheke şexsekî hatiye dizaynkirin, piştê di sala 2015'an de jî muwekilên me yê din Omer Hayrî Konar, Hamilî Yildirim û Veysî Aktaş veguhastine giravê. Muwekilên me li giraveke li bicihbûnê girtî, li serdanan girtî û herêmeke leşkerî ya qedexekirî ne. Aşkêre ye ku ew şewat wê yekser bandorê li birêz Ocalan û muwekilên me yê din bike. Di rewşeke wiha de ku di nav şert û mercên heylî yê giravê de rîskeke jiyani û lezginê e, destwerdana di cih de ya li şewatê cihê nîqaşê ye. Ev jî sedema tirs û fikirên mafdar in.”

Her wiha li başûr, bakur û rojavayê Kurdistanê sazî û dezgehên sîvil, partiyên siyasi der barê şewatê de daxuyani dan. Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) û Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) der barê şewatê de daxuyani dan û da zanîn ku divê demildest malbat û parêzer biçin Îmralityê hevdîtînek bikin. Li rojavayê Kurdistanê gel bertek û fikirên xwe bi çalakîyan anîn ziman. Her wiha li Kerkûk, Hewlêr, Kêlar û navçeyên Seyidsadiq a Silêmaniyê jî bo agahiye jî rewşa Abdullah Ocalan werbigirin çalakîyên girseyî hatin lidarxistin. Li gelek bajarên Ewropayê jî gel daketin qadan û xwestin parêzer biçin Îmralityê. AMED

Rûsya û Tirkîye hev tawanbar dikin

Rûsya û Rejîm li Idlibê êrişî leşkerên tirk kirin. Di encama êrişê de bi dehan leşkerên tirk mirin. Piştî êrişê Rûsya û Tirkîyê hevdu sūcdar kirin



Navenda Nûçeyan

Rûsya û rejîma Sûriyeyê li leşkerên tirk ên li Idlibê xist. Bi dehan leşkerên tirk û çete mirin. Wezaretê Parastinê ya Rûsya daxuyaniyek da û diyar kir ku Tirkîye peymanên Soçî bînpê kiriye, li qadên bêşer ên Idlibê topbaran kirine û piştgiyariya xwe ya ji bo komên çekdar berdewam kirine.

Piştî ku Rûsya û rejîmê li Idlibê xistin li Tirkîyeyê Twitter hat lawazkirin û rawestandin. Li gorî daneyên saziya NetBlocks.org, Twitter li gelemperîya Tirkîyeyê hatiye astengkirin. Demildest Serokê Desteya Bilind a Radyo û Televîzyonê Ebûbekir Şahîn jî der barê bûyerê de saziyên çapemeniyê hişyar kir û ferman da ku ji bilî hejmarên jî aliyê rayedarên dewleta tirk ve hatine eşkerakirin, agahiyeke din nedin.

Piştî pêşketina artêşa rejîma Sûriyeyê bi alikariya balafirên

Rûsya li Idlibê hişt ku noqteyên artêşa tirk werin dorpêçkirin û ew xalên ji bo herêma bêçek hatibûn avakirin diviya bû ji komên çeteyan bihatana paqijkirin.

Piştî pêşketina artêşa Sûriyeyê li Idlibê hikûmeta tirk gelek leşkerên xwe yê din derbasî herêmê kirin û li gelek deverên din ên ku berê lê tunebûn bi cih kirin. Her çend dihat zanîn ku artêşa tirk alikariyê dide komên çete yê ku li herêmê hatine bicihkirin jî piştî pêşketina demên dawî êdî artêşa tirk di nav wan koman de cihê xwe girt û aşkera tevî komên çete êrişî leşkerên Sûriyeyê kirin. Di ajansên fermî yê Tirkîyeyê de wêneyên leşker û çeteyan jî hatin parvekirin.

Peyman bînpê kirin

Rayedarên Tirkîyeyê der barê êrişê 27'ê sibatê de ragihand ku li Idlibê 33 leşker mirin. Wezîrê Parastinê yê Rûsya jî piştî êrişê daxuyaniyek da û diyar kir ku hedef çete-

bûn lê belê jî ber ku leşker li herêmê belavbûne encameke bi vî rengî derketiye holê.

Piştî bûyerê êdî nakokîya di navbera Rûsya û Tirkîyeyê de her ku diçe zelaltir dibe û hevdu tewambar dikin. Tirkîye dibêje ku divê leşkerên Sûriyeyê li derveyî xalên ku leşkerên wan lê heylî bûbûya, lê Rûsya jî dibêje divê Tirkîye li gorî peymanê Soçîyê tevbigeriya komên çete ji herêmê derxista derve lê Tirkîyeyê ew yek nekiriye û piştgiyariyê dide wan komên çete.

Rûsya û rejîm venagerin

Her wiha 2 roj jî muhleta Tirkîyeyê re mabû ew muhleta ku rayedarên tirk dabûn artêşa Sûriyeyê ku heta dawîya sibatê vegerin xalên xwe yê berê. Lê li gorî Rûsya û hikûmeta Sûriyeyê ew dê tucaran venagerin û dê heta dawî şerê komên çekdar bikin heta ku Idlibê jî wan paqij bikin û hemû deveran bixin bin serweriya hikûmeta Sûriyeyê.

Xweşkanî



Felemez Ulug

Rûsya tavîzê nade

Li Rûsya mîjara sereke Idlib e. Di mîjarê de gelek nîrxandin hatin kirin û daxuyani hatin dayîn. Lê ligel hemû zextan Rûsya di operasyonê li dijî komên çete de bi îsrar e.

Tirkîye jî bo van operasyonên ku di pêşengiya Rûsya de têt meşandin bide sekinandin û bihêle komên çete bîhnê bistînin û xwe li herêmê jî nû ve birêxistin bikin hemû derfetên xwe yê diplomatîk xistiye dewrê.

Di vê mîjarê de du welatên garantor ên civînen Astana û Soçîyê yanî Rûsya û Îran, dewleta tirk bi alikariya komên çete rexne dikin. Her wiha ev hêz jî ber ku dewleta tirk pêdivî û peymanên civînen Astana û Soçîyê pêk nayne nerazîbûnên xwe jî di her fersendê de tînin ser ziman.

Dewleta tirk di van salên dawî de di siyaseta xwe ya derve de li şûna lihevhatinê esas bigire di siyaseta pevçûn û kaosê de îsrar kir. Levma jî ber vê rewşa aloz û tevlihevîyê niha dewleta tirk nikare siyasete ava bike. Ji ber wê jî hem di hundir de hem jî li derve xitimandinê rizgar bike jî disa serî li rê û rêbazên şaş dide. Di şer de îsrar minaka ve şaşiyê ya herî berbiçav e.

Dewleta tirk di şerê Idlibê de xwe wek aliyekî dide nîşandan. Ji bo di vî şerî de bikaribe hebûna xwe biparêze sevkiyaten leşkerî dike. Gelek sevkiyaten wan jî hêla balafirên Rûsya ve hatin bombabarankirin û di encama van bombebaran de gelek leşkerên tirk jî mirin.

Lê jî ber ev sevkiyat ji derveyî peymanên li ser herêmê têt kirin Enqere bêdeng e. Rûsya û Îran, jî ber li ser peymanên hatine îmzekirin xwedî zanîyar in xwe xwedî maf û êrişên xwe jî rewa dibînin. Di vir de ya girîng û pêwîst mirov pirs bike ew e ku li gel van peymanên heylî û windahiyan ku pêk têt Enqere çima di siyaseta xwe ya şaş de îsrar dike?

Rêveberiya Erdogan jî bo bikaribe xwe ji vê rewşa kambax derbixe li Ewropayê di nav hewildanên diplomatîk de ye. Bi Almanya û Fransa ve dixwaze rewşê nerm bike. Lê hemû kesên rewşa herêmê jî nêz ve dişopînin dizanin ku dewletên Ewropa û NATO'yê li ser herêma Idlibê Rûsya nadin beramberî xwe. Ev jî wêneyê xitimandina siyaseta derve ya dewleta tirk e.

Rêveberiya Erdogan jî bo Pûtîn û Erdogan li hev bicivin pir kar dikin. Ji bo vî çend cara di astên cuda de serdana Moskwayê hatiye kirin. Lê herî dawiyê berdevkê Kîremlînê Peskov bi awayekî aşkera got ku “Erdogan ger dixwaze dikare bê serdana Moskwayê, lê daxwaza Pûtîn nîn e ku biçe serdana Stenbolê”. Bawer dikim ev îsra civîna bi Pûtîn re bersivê vekirî ye. Lê dê Enqere bixwaze bi Îranê re şensê xwe biciribîne. Di vir de pêwîst e mirov rola Îranê jî baş fêm bike.

Bu kurtasi mirov dikare ve bêje, nîzanim ev şer de bi Rûsya çî bide qezenckirin lê tîsta dizanim ew e ku dê ev şer bi Tirkîyeyê pir mezin bide windakirin.

Ger Tirkîye bi awaykî aqîlîselim tev-negere û xwe ji komên çete dūr nexwe wê di aliyê şer yê wenda kiriye de cihê xwe bigire.

Li ser romana Pêşmerge

Saliha Ayata

Rehîmê Qazî di romana xwe de tenê behsa şerekî nake, behsa îqtîdarê, kevneşopiyan û feodalîteyê dike. Behsa jina tune dike, civaka heyî de rola jinê diyar dike, mêrê xurtir dike, jinê zeiftir dike

Rehîmê Qazî, di sala 1925'an de li rojhilatê Kurdistanê, li gundê Gwîkceliyê, li navçeya Mukriyanê hatiye dinyayê. Ew ji malbateke bi nav û deng e. Rehîmê Qazî yek ji wan 60-70 kesan e ku di sala 1946'an de ji aliyê Komara Kurdistanê ve ji bo xwendin û perwerdekirina kadroyên rêveberiya komarê ji bo Bakûyê hatibûn şandin.

Piştî çûyîna wan bi pênc şeş mehan, Komara Kurdistanê têk diçe û gelek ji wan xwendekarên kurd vedigerin Kurdistanê. Lê Rehîmê Qazî û çend kesên din li wir dimînin. Paşê dest bi xwendina akademîk dike û di sala 1954'an de teza xwe ya doktorayê li ser tevgera neteweyî ya kurdan pêşkeşî Zanîngeha Bakûyê dike. Rehîmê Qazî romana bi navê Pêşmerge, di sala 1958'an de bi zaravayê soranî nivîsandiyê. Pêşmerge cara yekemîn di sala 1959'an de li Erîwanê, di sala 1961'î de li Bexdayê bi kurdî û di sala 1963'yan de li Bakûyê bi zimanê azerkî tê weşandin. Herî dawî Ziya Avcî vediguhêze kurmançî. Rehîmê Qazî di sala 1991'î de li bajarê Bakûyê wefat dike. Pêşmerge tê wateya kesê/a pêş diçe an jî rêber.

Şer û kesên derveyî şer

Rehîmê Qazî di vê romanê de bi şayesandinên baş û xurt behsa salên 1940'î yên Rojhilat dike. Behsa wan kesên dike ku di wan salên dijwar û zehmet de tev li berxwedanê dibin. Em dikarin wek romaneke dîrokî jî binirxînin. Di romanê de tişta herî zêde balê dikişîne ew e ku nivîskar

qala pêvajoya şer dike lê berê xwe dide kesên derveyî şer. Vê pêşiyê li ser Memend û axayê gund paşê jî li ser Pîrût, Mîrût û Şêrko vedibêje. Yanê di destpêka romanê de qala rewşa gund, jiyana gundiyan, desthilatdariya axayên girêdayî rejîmê tê kirin û piştê jî li hemberî van rewşan behsa beşdariya şoreşê tê kirin.

Qîrîna jinê û serhildan

Roman bi teswîrên xurt dest pê dike. Hem behsa xweşîkbûna xwezayê û hem jî zehmetiya xwezayê dike û di nav vê xwezayê de kesekî bi navê Mamend bi malbata xwe re di nav feqîriyê de dijî heye. Keda wî û malbata wî ji aliyê axayê zordest ve tê xwarin. Her ku diçe Mamend feqîrtir dibe û di dawiyê de jî mih-tacê nan dibe. Ji hêla din ve jî axayê girêdayî rejîmê jî jiyaneke di nav zewq û sefayê de dijî. Mamend ji bo zarokên xwe têr bike diçe ber derê axê da ku nan bixwaze lê axa dibeze wî, berî wî dide, wî diqewirîne. Ji bo zarokên xwe têr bike diçe daristanê da ku daran kom bike û bi firosê lê di rê de baran pir dibare, serma zêde dibe Mamend ji bo ku xwe biparêze dikeve şikeftê. Di dawiya romanê de em dibînin ku Mamend di şikeftê de qerisiye û miriye. Nivîskar Mamend li wir dihêle û dizivire behsa kurê Mamendî, Pîrût dike. Behsa kesayet û çelengbûna Pîrût dike. Di heman demê de em dibînin ku nivîskar behsa kevneşopiyên wê civakê dike. Ji bo zewacê du rê hene; yek berdêlî ye û ya din jî revandina keçan e. Pîrût di romanê de wek kesekî bisihûd tê bilêvkirin ji ber ku xwişkê wî heye û ne mecbûr e keçikekê birevîne, dikare xwişka xwe ji xwe re bike berdêlî. Xwişka Pîrût, Xezalê jî em di romanê de tenê du caran dibînin, ew jî ji bo berdêliyê behsa wê tê kirin. Jineke xwedî ked e, xwişk e lê ne Xezal e; xwişka Pîrût e, keça Mamend e. Heye lê di heman deme de tune ye. Xezal çi dixwaze çi difikire em qet nizanin. Xezal berdêlîbûnê qebûl dike lê bi rastî dil dide Şêrko (birayê hezkiriyê Pîrût) em nizanin ji ber ku beriya wê, birayê wê Pîrût der barê wê de biryara berdêlîbûnê

dide. Dema Pîrût û hezkiriyê wî diayxivin ev diyalog derbas dibe:

“Çavreşa min ez ê sibê jî babê xwe re bidim gotin û bila bê xazgî-ninîyan û te bi xwişka min re berdêlî bikin.” Ev diyalog nişanî me dide ku Pîrût evîndarê kî bibe dê xwişka xwe jî bide birayê hezkiriyê xwe.

Piştê Pîrût evîndarê keçeke ji gundekî din dibe. Navê keçikê Mîrût e ew jî jî Pîrût hez dike. Birayekî wê heye û dikare bi xwişka Pîrût re bizewice. Navê birayê Mîrût jî Şêrko ye. Mîrût û Şêrko bê dê û bê bav in. Li gorî wê demê Mîrût wek keçeke îdeal tê pênasekirin. Nivîskar dema behsa Mîrûtê dike behsa girêdana wê ya bi birayê wê re dike: “Pîrût behsa hestên xwe kir û li çavên Mîrûtê nihêrî.”

Pênaseyên nivîskar

Mîrût bêyî ku serê xwe bilind bike wiha bersiva Pîrût dide: “Fîlan-kes ez nikarim tişteki bibêjim, mesûliyeta min di destê kekê min de ye. Kekê min çi bibêje ez bi gotina wî dikim.” Tê xazgîniyê, li hev dikan û dest bi amadekariya dewatê dikin. Axayê gundê Mîrûtê jî dibe evîndarê Mîrûtê, li gorî pênaseyên nivîskar axa yekî kirêt, zikmezin û diranzizayî ye û çar caran jî zewiciye. Berê jî xwestiya bi Mîrûtê re bizewice lê Mîrûtê qebûl nekiriye. Axa lê dinihêre, Mîrût dê bi yekî din re bizewice, planekî çêdike û li daristanekê dest diavêje Mîrûtê. Mîrût naxwaze wisa bi wê ‘şermê’ bijî û xwe dixeniqîne. Nivîskar di vir de pir behsa hestên Mîrûtê nake, zêdetir Mîrût ji bo birayê xwe xemgîn dibe, li ber wî dikeve. Nivîskar Mîrûtê neçar dihele û rêya mirinê dide ber wê. Dema dê xwe bikuje van gotinan dibêje: “Ez bi sî cuziyên quranê jî sond bixwim kes ji min bawer nake. Ez ne girîng im, dê heya birayê min jî biçe.” Pîrût tê ber çavên wê û di dilê xwe de dibêje: “Ax Pîrût ez çiqas hez ji te dikim. Lê heya û namûsa keça kurd nehişt ez evîniya xwe nişanî te bidim. Tu bi Xwedê kî çi keç di şîna min de bûya dê eynî tişt bikira. Tu dizanî min li malê çiqas kum, gore û dest-mal jê re çinibûn. Bila Xwedê ke-

çeke xweşbext bike bextê te, xwezîya min bi wê ku...”

Mîrût di kêliyên dawiyê de jî difikire ku heke bimire Pîrût dê çawa bizewice? Difikire û dîsa nivîskar ji bilî mirinê tu rêyek din nade pêşîya wê. Mîrût çiqas difikirî hê ewqas zêdetir baweriyê xwe bi rastîya biryara xwe dani û ji xwexeniqandinê pê ve tu rêyêke din nedidît. Ji ber vê, Mîrût rabû û piştîniya xwe ji xwe kir. Aliyekî wê li guliyekî darê aland, aliyê din jî kir xelex û nefesa xwe ya dawî bi van gotinên di dilê xwe de da: “Umrê min qurbana te be birayê min ê delal, tu bi hêvî bûyî ku tu min bidî mîr û ji xwe re jinekê bîni. Lê hêviya te nehat ci, ez nizanîm ji vir şûnde dê tu bi kîjan rêyê bizewicî. Ez ji te re kor bim kekê min ê giyan, tu li hêviyê bûyî ku ez sibê jî te re qazyaxê (pincarek e, pê xwarin tê çêkirin) sor bikim, ez ji te re ker û lal bim” dibêje û xwe dixeniqîne. Em di romanê de dibînin ku heta nefesa dawî jî Mîrût qurbana birayê xwe û destgirtiyê xwe ye. Di kêliya dawî de jî ji bo Pîrût û Şêrko xemgîn dibe. Ji mirinê ditirse, li ber ciwaniya xwe dikeve, nakeve em nizanin. Em ê qet nizanibin...

Piştî mirina Mîrûtê roman derbasî mijara serhildana li hemberî axa û rejîmê dibe. Pîrût û Şêrko dixwazin tola xwe hilînin, planekê çêdikin û axa direvînin çiyê ku Mîrûtê xwe lê kuştiye, wî jî li wir, li heman derê dixeniqînin. Piştî vê bûyerê êdî nikarin vegeerî gund, li gund bijî, tev li serhildêran dibin û dibin şoreşgerên jêhatî.

Axayên rejîmparêz

Hêzên berxwedêr dem bi dem ber bi gund ve diçin. Serokê berxwedanê yê ku paşê dê bibe serokê komarê, Qazî Mihemed dixwaze eşîrên kurdan bîne cem hev û bike hêzeke mezin. Lê aligîrên rejîmê jî pir in. Ji bo axayên rejîmparêz jî holê rakin gund bi gund, bajar bi bajar digerin û wan axayan jî holê radikin. Demek şûnde diçin gundê Pîrût û hîn dibin ku axa çûye nêçîrê. Bavê Pîrût jî li gund xuya nake. Axa dizane kesên berxwedêr hatine gund

û li pey wî ne. Axa û fermanarê jendirmeyan bi hev re çûne nêçîrê. Dema nêçîrê di ber şikeftê de derbas dibin, Mamend dibînin, Mamend li ber mirinê ye lê tu kes alikariya wî nake û Mamend dimire. Li nêçîrê biryar didin ku divê vengerin gund. Nivîskar di dawiyê de dibêje: “Axa, fermanarê jendirmeyan û zabîten din cil û bergên jinan li xwe kirine û ber bi Tehranê ve çûne.”

Nivîskar jinê zeiftir dike

Rehîmê Qazî di romana xwe de tenê behsa şerekî nake, behsa îqtîdarê, kevneşopiyan û feodalîteyê dike. Behsa jina tune dike, civaka heyî de rola jinê diyar dike (heke namûs biçe wateya jiyana jina kurd jî namîne), mêrê xurtir dike, jinê zeiftir dike. Jina heyî ji bo mîr, ji bo namûsa mîr, ji bo zewaca mîr heye. Rêyan dide pêşîya mirovan; Pîrût dema axa dîkuje nikare vegere gund, diçe tev li şoreşê dibe lê dema Mîrût rastî destavêtinê tê, tenê rêyek dimîne, ew ji xwekuştinê û divê xwe bîkuje û serê mîran neke belayê, tu rê namîne ji bo Mîrût û dibe qerî-neke bêdeng...

Li vir, pîrseke girîng a ku divê bê pîrsîn heye. Rehîmê Qazî bixwe li welatêkî sosyalîst perwerde bûye û bi wê hişmendiyê mezin bûye, haya wî ji beşdariya jinan a şoreşgerên çîhanê û cihgirtina wan a di nav têkoşînê civakî de heye. Ya din wê demê her çiqas pergaleke feodal di nav kurdan de serdest be jî, jin dîsa jî di nav malbat û civakê de xwediyê cihekî cuda ne û di kevneşopiya kurdan de jina kurd gelek caran pêşengiya civakê û mîran jî kiriye. Mîrov li wêjeya kurdî ya devkî û mûzîka wan binihêre, bi hêsanî mirov dikare vê yekê bibîne. Ligel van her du rastîyan jî, mirov fêm nake ku çima Rehîmê Qazî Mîrût ewqas qels û bêhêz nişan daye û ji derveyî mirinê tu rê nedaye ber wê. Dibû ku ew bixwe jî beşdarî şoreşê bibûya. Ku mirov bi çavê jinê lê binihêre ev tişt jî bo romana Pêşmerge girêyêke berbiçav e û dikare bê vekolandin.



Ziwanê dayîke ayetanê Homayî ra yo

Nesrîn Navdar

Her çiqas 21'ê Sibatî rocêka xoverdayîş û fedakerdişê şarê Bengalî ya rayîrê ziwani de bo zî dimayo ke hetê UNESCO'yi ra sey Roca Ziwanê Dayîke ya Dinya ame qebûlkerdişî yanê serra 1999'ine ra tepya semedê têkoşîna azadiya ziwani yê heme şaranê ke ziwane înan hetê serdest û zordestan ra ameyo qedexekerdişî bîya çimayêke hêzgirotîşî. Helbet têkoşîn û xoverdayîşê şarê Bengalî yê ziwani tenê 21'ê Sibate dir sînozar nîyo. Têkoşînê înan ê verîne hemverê dagirkerê İnglîzan ke welatê înan kerdi di cay viraziya. Şarê Bengalî de hem mislimaney hem zî bûdîstî estê. Vernî de İnglîzan serra 1905'ine de sînor kerd miyanberê Bengalê mislimanan û yê bûdîstan. La her ke derbas bi şarê Bengalî fam kerd ke şaro ke ziwane, kultur û tarixê înan yew bo têrabîyayîşê înan neteweyê înan rê zerar o, têrabîyayîşê înan vernî ro bindestî û çinêbîyayîşê înan kena a.

Loma dimayê şeş serî Bengalê misliman û yê bûdîstî yewîtiya xo virazenê û serra 1911'ine de sînorê miyanberê xo darenê we û hemverê dagirkerê emperyalîstan bi ser konê. Dimayo ke İnglîzê mêtîngerî Hîndîstan ra vecênê mislimaneyê Hîndîstanî zî serra 1947 de bi nameyê Pakîstanî xo Hîndîstan ra ciya kenê. Şarê Bengalî yê mislimaney zî bi vatişê 'wayê û biratiya îslamî' ya Pakîstanî xapêyênê û konê miyanê xetayêke tarixî ya pile. Bengalê bûdîstî wazenê înan nê qerarî ra ageymnê zî bi ser nêkonê. La zehf nêşino tenê serrê ke dima ra ey rayêke bîne fam kenê ke asaso ke şaran pay ra verdeno tefaq û yewbîyayîşê miyanberê înan xo bi xo de yo.

Rêyî xo yê rastîni mojnênê ra

Dimayo ke Bengalê mislimani fek yewîtiya xo ya neteweyî ra verra danê, xo şarê xo yê bûdîstan ra ciya kenê û konê kiştî Pakîstanî ancî rast ro xetereyanê çinêbîyayîşî yenê. Pakîstano ke Bengalê mislimani bi vatişê sey 'biratiya îslamî, yewîtiya dîni vernîya yewîtiya neteweyî de

yena û wayê û birati pêgirotehiya guni de nîya pêgirotehiya bawerî de ya' xapênabi zehf xoseriya înan ser de zehf wext nêşino rêyî xo yê rastîni mojnênê ra.

Bi dîni xapênayê

Dimayo ke serra 1947'ine de Pakîstan bi hetkarîya şarê Bengalî awan beno warê Bengalî bi Pakîstanî wa yeno girêdayîşî û name zî beno 'Pakîstano Rochilat' rayveberîya Pakîstanî ya tekparêz e dest bi zilmê xo yê ro şarê Bengalî kena. Hema serrêke awankerdişê Pakîstanî ser de derbas nêbeno qedexeyê ziwane Bengalî ser de deyeno ro. Bengalî fam kenê ke kewtê miyanê xetayêke çiqas pile. Fam kenê ke Pakîstanî ey bi wayê û biratiya dîni xapênayê. İnan zanayne ke dîni îslamî de qedexeyê ro ti ziwaneke nîno tesdiqkerdişî û yeno waştîşî ke her qewm bieşko bi ziwane xo bicûyo. La nê birayê înan ê qaşo mislimani hemverê ayetanê ke Homayî tede muhîmiya qewm û ziwaneke ciya bi ciyayan dayo ramoştîşî zî veciyabi û ziwane înan qedexeyê û înkâr kerde.

İnkarkerdişê ziwaneke inkarkerişê ayetanê Homayî yo. Heqê her merdiman o ke bi ziwane xo qisey bikerê û aver berê. Gama Pakîstan ziwane Bengalî qedexeyê keno û ziwane Ordûkî ro şarê Bengalî dano ferzkerdişî kardî resena esteyê Bengalî û hemverê nê ferzkerdişê nijadperestî û tekparêzî serrê darenê we û serra 1948'ine de Tevgerê Ziwane Bengalî awan kenê. Tenê waştîşê Bengalî no bi ke ziwane înan bibo ziwane perwerdehî, la hemverê nê waştîşê înan pergala tekparêze yê Pakîstanî bi qirkerdişî û hepsikerdişî înan ser de şine. Têkoşînê înan ê ziwani ke hetê wendekaranê zanîngeha ra amîbî destpêkerdişî bi zêdebîyayîşê xoverdayîşê şarê Ben-

galî heta serra 1952 verdewam keno. Roca 21'ê Sibate 1952'yine de wendekari semedê serbestiya ziwani Zanîngeha Dakka de kom benê, la polisî erzenê zanîngehe ser û bi mudaxileyêke tundîkar wendekaran ser de şinê, derb kenê û înan hepis kenê. Dimayo ke wendekaran hepis kenê hema zanîngeha ra verê xo danê cayêke bîn, la ew ca zî mudaxile ro înan yeno kerdişî û dima ra çar wendekari bi guleyê polisani yenê kiştîşî. Dimayo ke hetê dewleta tekparêze ra çar wendekari yenê kiştîşî çalakîya wendekaran heme cayan de bena vila û şarê Bengalî zî kono kuçeyan, kerdişanê dewlete protesto keno û çalakîyanê xo zêdeno.

Mecbûr manênê qebûl bikerê

Roca bîn yanê hîris hezari ra zêde şar verê Zanîngeha Dakka de kom beno, polisî ancî mudaxile kenê û ancî çar wendekari zî hetê înan ra



yenê kiştîşî. Dimayê na bûyere ra şarê şarîstanê Dakka tamam konê grev û hemverê kerdişanê Pakîstanî bertekane xo mojnênê ra. Peyniya peynî şarê Bengalî bi xoverdayîşî û têkoşînê xo yê mafdare risenê heqê xo û tekparêzê dewleta Pakîstanî mecbûr manênê ke ziwane Bengalî qebûl bikerê û bikerê ziwane 2. yê fermî yê Pakîstanî.

Ziwan newe ra qedexeyê kerd

Aramiya ke dimayê dayîşê heqê ziwani virazyabi heta serra 1958 dom kerde, la gama 1958 de derbe virazyayî û Eyûb Xani ziwane Bengalî newe ra qedexeyê kerd. Şarê Bengalî fam kerd ke heta nêarsê azadiya xo ya rastîni ê go her wext xetereyê dagirkerê tekparêzan serreyê înan ser de kemî nêbê. Loma raya diyîne serrê dart we û heta risayî azadiya xo têkoşîna xo verdewam kerd.

Vinîbîyayîşê merdimî bi xo yo

Eyro roce senîni ke roca têkoşînî û xoverdayîşê Bengalî şarê bînanê rê biyo sembolêke, têkoşînê şarê Kurdî zî ke se serrê yo ziwane înan miyanê çerxê asimilasyonî yê netewedewleta dagirker û tekparêze ra derbas beno, qedexeyê û pêkûfî ser de kemî nêbenê, hewl dano ziwane xo biarsino cayo ke heq keno. Şarê Kurdî zî fam kerdo eke şaro ke bê ziwane bîmano meh-

kûmê vinîbîyayîşî yo. Her çiqas behsê vinîbîyayîşê ziwane yeno kerdişî, la rastîni na ya ke bi ziwani dir o şar bi xo ri erdî ra darêno we û beno vini.

Vinîbîyayîşê ziwane merdimî vinîbîyayîşê merdimî bi xo yo. Merdim eşkeno vaco ke ziwane ruh o, beden o, estbiyayîşî û netewbiyayîşî o û nasname yo. Ziwan rûmet o, vir o, famkerdiş o, kultur û tarix o. Ziwan ayetanê Homayî ra yo û merdimahirê xelatêko tewr erciyaye yo.

Wayîr ro ziwane xo veciyo

Gama merdim fek ziwane xo ra verra bido, fam beno ke merdim ruh, beden, estbiyayîş, netewbiyayîşî û nasnameyê xo ra fek verra dano. Gama merdim fek ziwane xo ra verra bido merdim bê rûmet, bê vîr, bê fam, bê kultur û bê tarixê maneno. Gama merdim fek ziwane xo ra verra bido merdim bawerîya xo dir kono miyanê nakokî, xo nêerciyaye vînenê û nêeşkeno hest û waştîşanê xo îfade bikero. Loma lazim o merdim vernîya her çî de wayîr ro ziwane xo veciyo û semedê bierso heqê xo yê ziwani çil azim bo bikero. Gere ma nêkerê xo vir ra ke merdim eşkeno bi ziwane bierso azadiya xo la wexta ziwane şoro merdim azad bo zî çinê yeno hesabnayîşî.

Vernîgirewtîşê qetlîyaman bi bedilnayîşê zihnîyetî beno

Merkezê Xeberan



Cemxane û Kulturê Pir Sultan Abdalî yê Şûbeyê Amedî yê Qezaya Rezan yê Amedî 25ê kanna 2011î de bi merasîmêk ameybî akerdene. Labelê Şirketê Anonîmî yê Vilakerdişê Cereyanî yê Dicle (Dicle Elektrik Dağıtım A.Ş.) bi mehneya fatûraya cemxaneyî nêameya dayene, cereyanê cemxaneyî bîna. DEDAŞ serra 2018î de cereyanê cemxaneyî bîna û aye wextî ra nata cemxane de ceryan çin o. Her çiqas ke reaksiyon bêri nîşandayene û derheqê babete de xeberî bêri virastene zî aye roje ra nata cereyanê cemxaneyî nêame veradayene.

Sewbîna vizêr nê perê Şirketê Vilakerdişê Cereyanî yê Denizli, Mugla û Aydinî (AYDEM) cereyanê Merkezê Kultur û Cemxa-

neyê Koşke bi mehneya 'Ganî dosya bêro newekerdene' bîna. Bado ke şar hedise eşnawit seba şermizar kerdişê rewşê, verê awaniye de ame pêser. Çiyo ortax yê nê wîrdî dezgeyan oyo ke wîrdî zî cemxaneyî û caardişê hemverê înan yew o. Seba ke elewîyî caardişê winasî yenî serreyê înan û berê hemwelatîjanê elewîyan zî yenî xêzkerdene û mergî reyde yenî tehditkerdene.

Zihnîyetê hemverê elewîyan tarix ra nata nêbedilîyayo û sebebê caardişanê winasî zihnîyetê cabîyaye yê dewlet û selahîyetdarane aye yo. Tarixê osmaniyan ra nata her çiqas ke nameyê şexsan bibedilîyo zî zihnîyeto ke Qirkerdişê Dêrsimî viraştî û o ke cereyan birneno yew o.

Heta ke no zihnîyet nêbedilîyo do caardişî û muameyê ciyakerdişî yê winasî dewam bikerî. Seba vernîgirewtîşê heme qetlî-

yan û caardişanê winasîyan, ganî merdim no zihnîyeto tehlukîyan bibedilno. Seba no bedilnayîşî, ganî karê ma yê yewine no bibo. Sebebê qetlîkerdişî, taciz, tecawiz, şidet û heme kerdişanê hemverê cinî û domanan zî no zihnîyeto lêşin ke xo mezgê merdiman de ca kerdo, yo. Ganî her ciyayê, reng û veng bicuyo. Ganî merdim hurmet nîşanê her ciyayeyan bido. Çimkî merdim bi xo zî çimane kesane bînan de ciya asiyeno. Eke ti hurmet nîşanê nêdî ciyayeyan, do hurmet to rê zî nêro nîşandayene. Eke ma yewbînanê baş bibî, na dinya mirdê ma heminan kena. Senî ke Homa dinya de her rengan bicaa kerdo, ganî merdim zî hurmet nîşanê nê heme rengan û ciyayeyan bido. Nêbeno ke herkes bîmano yewbînan. Dinyayêka winasî mumkin nîya. Dinya bi renganê ciyayan weş a.

Oxir be Zeynel Abdîn



Abdulkadîr Ulumaskan

Em bi ahagiya mirina nivîskar û helbestvanê kurd ê hêja Zeynel Abdîn Han, gelekî xemgîn bûn. Min jî bi peyameke kurt xemgîniya xwe diyar kiribû û ji malbatê û gelê kurd re sersaxî xwestibû. Lê dilê min bi diyarkirina kurtesersaxiyê rehet nebû ku tenê bi du-sê hevokan ez/em behsa kekê Zeynel Abdîn Han bikin û derbas bibin. Ji ber vê ez duh êvarê bi hêsanî ranezam û min xwe deyndar dît ku li ser hêjayî û welatperweriya Zeynel Abdîn hinekî din raman û hestên xwe binivîsim.

Mamosteyê gorbihuş Zeynel Abdîn Han, nivîskar û weşangerekî kurd ê hêja bû. Wî ji bo wêje û zimanê kurdî gelek berhem nivîsandin û gelek berhem çap kirin. Bi rastî ew xemxwar, kedkar û êvindarekî zimanê kurdî bû. Wî bi xemxwariya parastin û pêşketina zimanê kurdî gelek pirtûk nivîsandin. Çapgeriya wî jî ji kar bêtir, bi tégihştin û hişmendiya evîndariya zimanê kurdî bû. Li Ewropa û bi taybetî jî li Almaniyayê piraniya nivîskarên kurd, berhemên xwe bi alîkariya çapxane û weşanxaneya wî weşandin û gihandin gelê kurd.

Tenê ji bo piştgeriya wêje û zimanê kurdî Zeynel Abdîn gelek pirtûk bêyî karê jê bike an jî kareke pir kêm çap kirin. Dêrdê wî xizmeta zimanê kurdî bû. Du sal berê dema min xwest ez romana xwe li ba wî bidim çapkirin, wî nivê mesrefa çapê da ser xwe û bi nivê heqê çapê tenê wergirt.

Zeynel Abdîn Han, ji bo pêşketina weşanxane û çapxaneya kurdî, li bakur, başûr û rojavayê Kurdistanê jî gelek hewl dan û dixwest xebatên çap û weşangeriyê li her aliyê Kurdistanê belav bibe ku wêje, çand û zimanê kurdî di nav civaka kurd de geş û belav bibe. Lê mixabîn temenê wî rê neda ku ew encamên hewladan û xebatên xwe baş bibîne. Belê belkî her mirin jî bo mirovan zû ye lê bi rastî mamoste Zeynel gelekî zû ji nav me koç kir û gelek xebatên wî nivco man.

Cardin pir mixabîn Zeynel Abdîn Han jî wek gelek kurdên welatperwer bi hisreta azadî û serxwebûna Kurdistanê li xerîbiyê jiyana xwe ji dest da. Her mirin zahmet e lê mirina li penaberiye û bi hisreta azadiya welêt û gelê xwe gelekî zehmet û diwartir e.

Bîr û bawerîya me bi azadiya Kurdistanê heye. Di Kurdistanê azad û serbixwe de nivîskarê kurd ê hêja Zeynel Abdîn Han, wê bi ked û berhemên xwe mayinde bibe û di nav dil û gelê kurd û Kurdistanê de her bijî. Oxir be ji te re kekê Zeynel.

Veşartîya ‘Qamişloya Bajarê Evînê’

Dildarê Amedê

Hunermendê kurd Seîd Yûsif ku hemû jiyana xwe di xizmeta mûzîk û strana kurdî de derbas kir, ji ber nexweşiya penceşêrê beriya demekê hatibû Tirkîyeyê û li nexweşxaneyê bajarê Stenbolê dihat dermankirin. Mixabîn hunermendê kurd di 26'ê meha sibata 2020'an de çû ber dilovaniya xwedê.

Hunermend Seîd Yûsif an jî bi navê xwe yê din ku wekî Mîrê Bizqê dihat binavkirin, ji ciwanîya xwe ve dest bi karê muzîk û stranê kiriye û di demeke kin de nav û dengê wî li seranserê Kurdistanê belav bû û bû stêrkek ji stêrkên strana kurdî.

Seîd Yûsif di 1947'an de li bajarê Qamişlo li taxa Qudûr Beg hatibû dinyayê. Di ciwanîya xwe de bi bizqê dest bi muzîka xwe kir û paşê jî piraniya gotinên stranên



xwe û awazên wan jî wî bixwe çêdikirin. Hunermendê bi nav û deng di pêvajoya jiyana xwe ya hunerî de derdora 700 stran amade kirine ku piraniya wan gotin û awaz jî yên wî ne.

Hunermendê me demekê li Beyrûta Lubnanê jî dijî û li wir komêke muzîkê ya bi navê Koma Newroz ava dike. Di wê demê de

ango di salên 1960'î de bi stranên wekî ‘Ez keçim keça kurda me’ û ‘Ay Felek’ û hin stranên wî yên bi nav û deng li seranserê Kurdistanê belav bûn.

Seîd Yûsif di çîroka jiyana xwe û hevaltîya xwe ya bi muzîka kurdî re gelek xelatên hêja wergirtine û her wiha wekî gelek hunermendên kurd êş û jana ji-

yana xizani û tunebûnê jî kişandiye. Li kêleka gelek xelatên hunerî rêxistina navneteweyî UNESCO jî di sala 1973'an li Parîsê jê re plakeke zêrîn ji awazên wî tomar kiribû.

Hunermendê me jî erê bi rengekî fizîkî ji nav me bar kir lê nav û dengê wî, muzîk û stranên wî dê bi sedên salan wekî xezîneyekê li pey wî bimînin û hîna wê gelek nîşên nû yên kurd bi wê muzîkê mezin bibin. Dibe ku wî jî zarok û malbata xwe re mal û milkên zêde nehiştibin lê wî jî gelê xwe re xezîneyêke stranên hiştiye.

Seîd Yûsif her çendî li xerîbiyê jiyana xwe ji dest dabe jî, ew ê vegere bajarê zarokatiya xwe, ew ê vegere bajarê ku navê evînê lê kiribû. Ew ê vegere hembêza Qamişloka evînê. Dê jî nû ve şevbêrkên xwe bi Mihemmed Şêxo û Seydayê Cegerxwîn re berdwam bike.

Lêgerîna Alî Kemal Çinar di sînemayê de

Welat Ramînazad

Behman Gobadî her çiqas bi filmê xwe yê dawî *Demsala Gergedanan* têkçûnekê xwar jî lê karîgeriya Behman Gobadî di sînemaya kurdî de gelekî radikal e. Xelatên mezin wergirtine filmên Behman Gobadî, mirov dikare bibêje ku ontolojiya sînemaya kurdî geştir û bihêztir kir. Yek ji wan jî Alî Kemal Çinar e. Hê jî karê xwe dike û dev ji kurdî bernedaye.

Veşartî di sala 2015'an de hatiye kişandin. Piştê *Genco* (2017) û *Di Navberê De* (2018) hatiye kişandin. Dema ku min xwest wan sê filmên wî temaşê bikim, di înternetê de tenê min li ser *Youtubeyê* filmê *Veşartî* peyda kir. *Genco* û *Di Navberê De* tune bûn, ji xeynî *Veşartî* çend kurtefilmên wî yên din jî li ser *Youtubeyê* hebûn. Ez ne xelet bim niha jî hewl dide ku filmê xwe yê nû bi navê *Beriya Şevê* bikêşe.

Di struktur û arkaika filmê de Platon, Kafka, emeliyeta guherandina zayendê û mîteke kurdan hene (Ez nizanim di nav civakên din de jî ev mîte heye an jî tune ye). Li gorî Platonî, însan berê yek zayend bû, piştê wekî jin û mîr bû du zayend. Eşqê jî wekî lêgerîna peydakirina parçeyê xwe yê din pênas dike. Di berhema Kafkayî ya navdar *Veguherînê* de Gregor sibehekê jî xewê hişyar dibe, dibîne ku veguheriyê kêzîkê. Hinek jin bi emeliyete xwe dikin mîr, hinek mîr jî xwe dikin jin. Ev guherandinê hê jî di nav gelek civakan de nehatiye qebûlkirin, wekî problemeke çaresernekirî tê dîtîn. Mîteke di nav kurdan de heye: Kî di binê keskesorê re derbas bibe zayenda wî diguhere; ku jin be dibe mîr, ku mîr dibe jin. Cudatiya mijara *Veşartî* ew e ku veguherandina zayendî bi xwezayî çêdibe.

Veşartî filmêkî jêpirsker e, rexneker, jiberxerakirî ye, bi awayekî din fikirin, nêrîn û dîtîn e...

Çîroka filmî, çîrokeke realîzma



efsûnî ye. Karakterê sereke derhêner Alî Kemal Çinar bi xwe ye, di kaneke wî heye. Rojêkê jineke nenas tê dikana wî, çîrokeke cuda der heqê mirina bavê wî de ji wî re dibêje. Dema ku bavê wî bûye sî salî, bi xwezayî jî mîrî bûye jin. Ji wî re dibêje dema ku ew jî hat sî saliya xwe ew ê jî wekî bavê xwe zayendê biguherîne û bibe jin. Film li ser vê ihtimalê ava bûye. Guherandinê problematîze dike. Têkiliya takekes, civak û guherandinê, bi taybetî jî zayendiya civakî tê nîqaşkirin, pirsîyarkirin û qisekirinê em gelek diyardeyên xwe yên kesayetî, kulturî û neteweyî gelek bi lez diguherînin. Bextiyar Elî di romana xwe ya bi navê “Apê min Cemşîd Xan ku her tim bê ew li ber xwe dibir” de jî hêla kesayetî, kulturî û neteweyî de guherandinê me problematîze kiribûn. Alî Kemal Çinar jî neguherandinê me jî xwe ra kiriye problem. Gelo kîjan ferztir e ku em ji xwe re bikin problem? Mesela guherandina Ziya Gokalp, Seîdê Kurdî, guherandina malbata Mihemed Mihri Beyî, herî dawî jî mînakê guherandina Rojhan Bekenî...

Derhêner xwestiye filmê xwe wekî jiyana rojane bikişîne da ku ewqas naturel bibe. Piraniya listikvanan ne profesyonel in. Gelek listikvan ji malbatê heval û hogirên Alî Kemal Çinar in. Problem ne amatorbûna listikvanan e, problem ew e ku psikoloji û hewayê listikvanan dide hişkirin û nîşandan ku ew di nav filmekî de dilîzin. Piraniya listikvanên filmên Behman Gobadî û filmê Hewno Bêreng amator bûn lê hewayê wan qet neda hişkirin ku di filmekî de dilîzin, wekî rastiyê bûn. Listikvanên filmî gelek sunî, çêkirî, nerehet, sî-norkirî û ne xwezayî û ne bixwebawer in. Krîz, dînbûn, buhran, xwekuştin û şoka guherandinê, em di lehengan de nabînin. Ew tarûmar û serobin nabin. Mînak karakterê sereke qet çêr û sixêfan nake, pir aram û xwînsar e. Ji ber vê, derhêner nekariye xwestina xwe wekî natural û realîte pêk bîne.

Temaşevanên ku bi kurdî baş dizanin ji kurdiya kurmancî ya filmî gelek aciz dibin. Ziman pir qels û xirab e. Sentaks û mentîqa tirkî xwe pir nîşan dide. Diyalogên filmî motamot bi hêsanî li tirkî tîr wergerandin. Jixwe tiştê ku bi hêsanî li tirkî an jî li zimanekî din nayê wergerandin kurdiya resen e. Tehm, zewq û ruhê kurdî di zimanê filmî de tune ye. Mirov dibêje qey senaryoya filmî berê bi tirkî nivîsandiye, dûre wergerandiye kurmancî. Biwê-

jek, gotineke pêşyan di zimanê filmî de bala temaşevan nakişîne.

Aciziyêke din diyalogên li ser guherandinê ne. Bi van diyalogan derhêner dixwaze fikrên xwe bi temaşevan bide qebûlkirin wekî mamosteyekî mizgeftê an jî dibistanê. Hem jî reseniya wan diyalogan tune ye, mirov dibêje qey ji cihinan îthal kiriye. Bi van diyalogan û bi hevokên divêtiyê krîza problema guherandinê çareser nabe.

Li rexmî hemû nakokî û qelsiyên filmê *Veşartî*, aliyê herî baş û bihêzê *Veşartî* lêgerîna ceribandînen nû, gihîştina resenî û guherandina realîteyê ye.


Film ne bi diyalogên xwe lê bi hebûna xwe realîteyê diguherîne û jî bi guherandinê jî cesaret dide temaşevan. Alî Kemal Çinar bi vî filmî xwestiya guherandina herî radikal jî normalîze û jî rêzê bike. Di filmî de wekî ifadeya “ji guherandinê netirsîn” gelek tê dubarekirin, wî xwestiye hinek realîteya civakê bişikîne û biguherîne. Dawitîrîn sehneya filmî, filmî çawa realîte guherandiye nîşanî me dide. Ranciere çi gotibû “Divê huner realîteyê teqlid neke, divê realîteyê biguherîne”, Alî Kemal Çinar jî tam vî tiştî dike.

Derhêner bi ceribandînen nû filmê xwe kişandiye: Film li Amedê derbas dibe. Film jî destpêkê heta dawiyê bêreng e. Reş û spî ye. Kostum, makyaj û hwd. tune ne. Di sînemayê de tiştê ku di temaşevan de hîsiyat çêdike muzîk e, derhêner bi muzîkê his û hestên temaşevan bi rê ve dibe. Di *Veşartî* de muzîk tune ye. Sehneyên filmî bêmuzîk in. Wî xwestiye film bi qasî jiyana rojane naturel be.

Filmkişandin budçeyêke giran dixwaze. Lê Alî Kemal Çinarî bi îmkânên gelekî kêm filmek afirandiye. Ji vir jî xwestiye xwe bigihîne reseniyeke û tiştêkî nû biafirîne.

Gelo di filmên *Genco* û *Di Navberê De* de ev lêgerîn çiqas kemiliye, bi pêş ve çaye û kûrtir bûye?

Di Avestayê de jin



Aysel Tabak

Zerdeştî ola herî kevn a wehiyî ye. Ji sedsala şeşan a Beriya Zayînê (B.Z.) heta sedsala heftan a Piştî Zayînê (P.Z.) li Îran, Mezopotamya, Azerbaycan û Hindistanê ola herî belavbûyî û fermî bû. Piştî ku erebên misilman Îran û Mezopotamyayê dagir kirin piraniya zerdeştîyan neçar man koçî Hindistanê bikin. Yê mayî jî piraniya bûn misilman.

Cihê ku zerdeştî derketiye holê teqez nayê zanîn lê piraniya lêkolînerên vê mijarê li ser Bakriya, Harezmi û welatê Medyayê disekin.

Bingeha zerdeştîyê digihîje olên kevnar ên hind-iranî. Gelek ayetên Avestayê dişibin metnên pîroz ên ‘Veda’ya hindan. Di heman demê de navên heyî yê pîroz jî dişibin hev. Agir û av hem di baweriya hindan de hem jî di zerdeştî-Avestayê de gelek girîng e. Ji bo av û agir qurbanî didan û diyarî pêşkes dikirin.

Ahûra Mazda û Zerdeşt

Di baweriya zerdeştîyê de Ahûra Mazda xwedayê mezin û yek e. Hin ruhên pîroz jî hene ku alîkariya kar û barên Ahûra Mazda dikin. Ev heft ruhên pîroz in ku ji wan re ‘Ameşa Spanta’ (ruhên comerd) tê gotin. Her yek ji wan berpîrsiyarên qadekê ne. Mînak ‘Aşa Vahišta’ agirî diparêze û rêya rast nişani ruhên pîroz dide. ‘Vohû Manah’ (aqilê baş) li cînetê pêşwaziya ruhên-kesên pîroz dibe û temsîla hişmendiyên qenc e.

Zerdeşt jî malbata Spîtama pêxem-



berê zerdeştîyê ye yekta ye. Diyarîkirina dema jiyana wî ne teqez e lê piraniya lêkolîneran li hev dikin ku di navbera sedsala 11 û 6’an a B.Z. de jiyaye. Zerdeşt ê ku hem pêxember hem jî keşişê ve olê ye, di 30 saliya xwe de wehî jê re hatiye. Pêşî Vohû Manah xwe nişani wî daye, paşê ew biriyê hizûra Ahûra Mazda. Zerdeşt baweriya xwe bi Ahûra Mazda anî û bû pêxemberê wî.

Bi awayekî giştî tê zanîn ku dema ola zerdeştîyê derketiye holê li piraniya cihanê jin di nav civakê de gelek bê qîmet bûn û asta statûya jinan di nav civakê de gelek li jêr bû. Lêkolînerên Avestayê piraniya hemfikir in ku bi derketina zerdeştîyê û belavbûna li deverê berfireh, rewşa jinan gelek guherîye û baş bûye. Gava em li ayetên (Stenza) Avestayê dinêrin bi rastî jî wekheviya jin û mêran dibînin. Nişaneyê pêşî em dikarin bînin ku şeweya bangkirina Ahûra Mazda û Zerdeşt e. Hema hema di hemû Sten-

zayan de Ahûra Mazda û Zerdeşt bi xwe bangî ‘jin û mêr ên xweyî gotin û hişê qenc’ dibe. “Ey jin û mêrên qenc, bi guhên xwe tiştên herî qenc bibîhîzin û bi hişên xwe zelal bifikirin. Ji bo ku di navbera herduyan de (qencî û xerabî) başiyê hilbijêrin bi hişê zelal bifikirin” (Yasna 30/2). Heta di hin Stenzayan de ewil bangî jinê dibe; “Ez hewl didim wan doktrînan hînî we jinên nezewicî û we (zavayan) bikim, şîretan li we dikim. Bi awayekî jidil bala xwe bidin fikirîn qenc û wan di nav xwe de bihevînin, ji ber bikin û hîn bibin” (Yasna 53/5,6,7).

Di Avestayê de çîrok an destanên ku behsa afirandina jin û mêran dibe tune ne. Tenê dibêje ‘Ahûra Mazda meriv, heywan û zindiyên din afirandine’ (Vendidad 2/35-38). Cara ewil dema ku Ahûra Mazda der heqê serdema cemedê de hişyarî û şîret dide, behsa jinê tê kirin. Xweda ji Yima Kişhata (Di destanên persî de Mîr Cemşid) re

dibêje ku warek bi navê ‘Vara’ ye ava bike û jin û mêran, heywan û heyînen din li vir bi cî bike û bi agirî germ bike. (Vendidad 2/1-43)

Di Avestayê de jin tenê bi karên malê mijûl nînin. Di nav civakê de berpîrsiyariyên cuda cuda jî dikeve para wan. Di hin beşên Yasnayê de pêxember û Ahûra Mazda bangî jinan dikin û dibêjin ku xwe di warê hînbûn û perwerdeyê de xurt bikin û zanîn û tecrûbeyên xwe hînî kesên qenc û xwedî hişmendiyên baş bikin. Ji jinan tê xwestin ku bibin mîsyoner û baweriya zerdeştîyê belav bikin. “Yên ku rastiyê (doktrînen zerdeştîyê) dizanin, jin û mêr, van rastiyan hînî kesên din bikin” (y. 35/6). Kesên ku bikaribin di civakê de bibin rêveber divê sê sal perwerdeyê bibînin. Jin jî tevî ve perwerdeyê dibin û piştê dibin mîsyonerê zerdeştîyê.

Ji xeynî vana der heqê azadbûna jinê de jî hin ayet agahiyên girîng didin. Mînak jin gava dizewicin dikarin mêrê xwe bi xwe hilbijêrin. Ev yek gelek girîng e. Tê zanîn ku di heman serdemê de li hin deverên wek Yewnanistanê ku dibêjin dergûşa şaristanîyê ye û li welatên din ên Rojava jin bi xwe nikaribûn mêrên xwe bi xwe hilbijêrin. Berî zewacê bindesta bavê bûn piştî zewacê jî ya mêrî. Lê di zerdeştîyê de jin azad bûn. Di çend Stenzayan Yasnayê de behsa zewaca keça Zerdeştî ya biçûk Pourukista tê kirin. Zerdeşt di vir de şîretan li keça xwe dibe dibêje, “Gava te hevserê xwe bijart serî li zanebûna xwe bide. Li gorî zanîn û baweriya xwe biryarê bide” (y.53/3) û her wiha di tu derê Avestayê de nabêje ku mêr serdestê jinê ye yan jî divê jin xizmeta mêr bike. Bi giştî dibêje bi hev re bi hişmendiyê qenc karên baş bikin.

Jin û ritûel

Aerpatîstan beşek ji bo keşişan e. Hemû beşên wî negihîştine dema me lê halê hazir di beşên heyî de hin agahiyên der heqê jin û xebatên wan de hene. Wê demê karê merivan bêtir cotkarî bû. Jin û mêran tenê di wextê ayîn û ritûelan de dikaribûn dev ji karê xwe berdin. Di serdema pêşîn a avestayî de jin wek keşiş dikaribûn tev li ayîn û ritûelan bibin. An jî di perestgehan de agirî (ku di baweriya zerdeştîyê de pîroz e) diparastin. Di beşa “Vispered”ê de behsa ayînen demsalî tê kirin. Gazi jin û mêrên qenc tê kirin da ku tev li van ayînen pîroz bibin.

Wek ku dixuyê di serdema pêşîn de jin di civakê de xwedî berpîrsiyariyên girîng bûn lê bi demê re di bin bandora hin bawerî û têgihên biyanî de ji doktrînen orjînal dîrdikevin û rol û girîngiya jinan di civakê de kêm dibe. Serdema Vendîdadê (Beşeke Avestayê ye) û hin nivîsên dema sasanîyan ve paşketina statûya jinan nişan dide. Dîsa jî di zerdeştîyê de mafê jinan ji gelek deverên cihanê baştir bû.



“Her nîfş xwe ji ya berê zîrekîr û ji yê bê alîmtir dibîne.” **George Orwell**

1. Bogota

Nîfş: Neferên nîfşekê, kesên ji heman kom û girseyê ne ku di heman demê de dijin û derd û xem û kulên wan kêm zêde eynî ne. Yanî hemû ji bi awayekî berhemên heman dem û derê ne. Mîsal nîfşa Rewşenê, nîfşa Beatê, nîfşa mileniyûmê.

Nîfş (jenerasyon), wek peyvek bi wateya xwe ya îroyîn xwedî dîroqçeyê ne zêde dîrî zemanê me ye. Beriya sedsala 19’emîn gava ku behsa jenerasyonê dibû piraniya tîkiliyên malbatî dihate bîra mirovan (famiyal generation). Yanî qewşekî insan ji heman jenerasyonê bûna, dihat wê maneyê ku ji heman malbatê ne ji.

Di 1863’an de ferhengzanê (leksikograf) fransî Emile Littré, cara ewil ev peyv bi wateya ku em îro debara xwe ya rexnegiriyê pê dikin bi kar tîne û dibêje “ber kesê/a ku di heman demê de di civakê de dijin ji nîfşekê ne.” Bi vî hawî peyva nîfşê êdî ne bi tenê wateya lêbarîkirî lê bi wateya lêçêkirî jî tê naskirin û naverokeke civakî jî di hundirîna (social generation). Lêbelê serencama manelêbarkirinê li vir naqede. Danerê pozitîvîzmê Auguste Comte dibêje, “Guberîna civakî bi dijberiya navbera nîfşên li pey hev çêdibe.” Dûre Karl Mannheim bi teoriya xwe ya nîfşê dibêje ku nîfşekê ancax bi bîyeren dîrokekê ku rê li ber ciwanan vedike ku ji nîfşên berê cudatir li dinê binêrin, çêdibe. Norman Ryder jî di 1965’an de diyar dibe ku nîfşên nû di heman demê de bim ji bo îstîq-



Bîlal Ata Aktaş

Juvenoia

rare gef in him jî ji bo guberîna civakê derfeteke in. Gava ku sal dibe 2007 Amanda Grenier bi awayekî cuda li ser heman mijarê hûr dibe û bersiva pîrsa “çima di navbera nîfşan de pozberî û tansiyonekê heye?” wiha dide: “Çimkî nîfşên nû piştî demekê ji xwe re model û jargona axaftînekê, yanî zîmanekî cuda hildibijêrin û şas-fahmkirina zîmanî qedereke paşê dibe şaşfahmkirina nîfşî. Ev jî bivê neyê di dijberiya navbera nîfşan de timî zîndî digire. Nîfşa berê ya nû xirab dibîne û xwezîya xwe li zemanên berê tîne. Gelo ev best ji derveyê welat, kultur û zeman û mekânê azade çima ewqas berbelav e?”

2. Klîmanjaro

Di 1240’an de keşekî bi navê Peter the Hermit giliyê xwe li zarokên wê çaxê dibe û dibêje ku ji wan tirê her tiştî mîna wan e. Sal 1871, rojnameya The Sundayê dîsa gazinan dibe û mealên dibêje êdî millet bi not û tîbînîyên kurt pevre dîyalog datîne, xwezî bi wan rojan ku em li dor nameyekê ewqas hûr û kûr dibûn. Di sala 1907’an de rojnameya The Journal of Education jî tiştêkî wiha dinivise: êdî malbatên modern bêdeng li derdora agirêkî tov dibin û qafê her kesî li ber wan e û kevarekî xwe dixwînin. Arîsto jî 4 sedsala beriya Îsayî gotiye ciwanên wê çaxê difiki-

rin ku her tiştî dizanin.

Di zanîstê de ji bo wê hestê navekê heye: juvenoi. Yanî xerabdîtina nîfşên nû.

Ev peyv ji teref David Finkelhor ve di 2011’an da hatiye formulêkirin.¹ Ew bixwe wê hestê wek tîrs û xofekê fişal û pirolekirî dibîne. Ji hêla peresanê ve ew xof fahmbar e. Çimkî pêşiyên me yê xwedî wê tîrsê wek organizmayên biyolojîk ferdên serkeftî ne, şiyane di heyatê de bimînin. Yanî rêya her ku çi be tîrsê derbas bûne rêyêke ewle ye. Loma dixwaze dewamiya wî/ê jî (zarokê wî/ê) heman tiştî bike. Çaxa ku zarokên nû-gihaştî tiştên ji dê û bavên xwe cuda dikin, mezin dibe û şik û gumanê çimkî kirina tiştêkî nû ji bo berdewamiya cînsê wan tiştêkî nepen û neispakîrî ye. Wê mînak, li gorî îstatîstîkan, nîfşên berê ji muzîka elektrônîk zêde hez nakin û li dijî zewaca hemcînsî ne. Eger civakê ku ew cure muzîkê de belav û zewaca bi vî şiklî pêkan be, dê ew civak bişibe çî nîzanan. Loma dik-evîngezariyê, endîşe dikin û li dijî van tiştan derdikevin.

Ji bo sedemên sosyo-polîtîk jî divê em berê xwe bidin sedsala 19’emîn. Çimkî sedsala hanê, ji bo xebatên civakî xala werçerxê ye. Piştî şoreşa endustriyê cîmaet û cemiyetên

celeb celebî serobino bûn. Di nav wê kaos û hilberîna bêsinor de pêdivî bi gelek tişt û kesan hebû. Ji ber ku hingê tîrîkê modernîteyê hêj vala bû, luksa hîlbijartîna kesên serbêjîng bixwe dibû luks. Loma hemû kesên li derveyê qada giştî hêdî hêdî derketin ser rîyê erdê. Jin jî malê derketin xebitîn, zarok çûn fabriqeyan bûn karker. Loma li dijî mîran re-qîbên desthilatîyê derketin û nakokî û dijberîya ku ji destpêka cînsê me ve bi me re ye her gurtir bû.

Bi nezera kulturî, mirov dikare bibêje ku zemanên berê (ancient régime – rejîma kevn), xebatên çand û hunerî çî ji bo milletê çî ji tîrêf milletê de di hate hilberîn û mezaxkirin. Ji ber ku yê berhemên çêdikirin û bi kar dianîna çîna bilind, elitên wê derê bixwe bûn. Heta di neqeba çînen civakî de ew çend cudahi hebûn ku tebeqeya serî ya civakê bi zîmanekî cuda diaxivî û millet jî bi yekî din. Piştî veguherîna bi lez û bez huner bêhîr demokratîze bû û bêza pênasêkirina çînen bilind tîna xwe berda. Yekdestî û monopola elitîstan şikist. Tabî piştê xebatên bi vî şiklî populer bûn û di nav gel de belav bûn. Berbijarî û imîtiyaza komeke nîfşên berê lerizî û heta qonaxekê her ku çû kêmîr bû. Lê dîsa jî ji bo gelek kesan çand û huner jî ber şideta sîstema berê hê jî wek lebk û xebateke bilind ma.

Hatbinî: Nivîsa hanê îlham û mînakên xwe yek ji kanalên herî serkeftî yê Youtubeyê ya bi navê Vsauceyê girtiye. Ji bo çavkanî, naverok û agahiyên berfirehtir lê binêrin ji kerema xwe...

¹-David Finkelhor, *The Internet, Youth Safety and the Problem of “Juvenoia”*, 2011.